

PIRS

Pêrist

Kovareke
Rewşenbîrî
Serbixwe ye

Pêşgotin -----	2
Kirmanckî (Zazakî) ----Roşan Lezgîn	3
Hevpeyvîn -----Pertewê Şerqî	9
Mem û Zîn ----- Rizgar Kurdaxî	14
Brêxt-----Tengezar Marînî	20
Desmaleke -----Fatma Savci	24

Helbest

Erê Efrîna min --- Ebdilmecît Şêxo	26
Zimanê gnehiyê-----Edonîs	28

Çêrok

Zinarê Şeyda -----Zamdarê Zindî	29
Li dibistanê-----Mistafa Henan	34
Pêncîsaliya-----Zîna Şikakî	38
Aloziya kesê siyemê----D:Roza Elî	43
Ji bingehên -----Merwan Berekat	47
Nameya kovarên Kurdî -----	48

Hejimar:39
Payîz: 2007

Bihha:50 p.s

www.kovarapirs@yahoo.com

Pêşgotin

Weke tê nasîn ziman ji hemî peyv û bêjeyên wî miletî çêbûye. Aya her zaravek parek ji zimên e û ew bi temamî nikare bi kar û barê ziman dike pê rabe. Lê, gava zarav di nivîsandinê de bi kar tê û çap dibe, ya serzarî (devîkî) derbas dike û xurtibûnekê dide wê zaravê. Zimanê bi hemî zaravan tê nivîsandin, bêtir dewlemend e. Mîna zimanzan dibêjin "Tu zarav ji yê din çêtir nîne, rêzmanaxwe ji yê din ne rast û duristir e. Di vir de girîngiya hemî peyvên di zaravekê de û di yê din de tunene, divê di nivîsandinê de bi kar bên, ku kelepûra wî zimanî bête vejandin û nivîsandina netewî (stenderkirî) jê çêbibin. Li vê dawiyê hin deng bi der dikevin ku zarava Soranî li şûna zaravên din bibe zimanê nivîsandina miletê Kurd û bi tûjî êriş nivîsandina bi zarava kurmancî û danerê alfabêya kurmancî (Mîr Celadet Berdixan) dikin. Ev êriş li ber siya kîjan nêrîn û ûşt û sedeman be, wê milet û zimanê Kurdî dabeş bibin û ziyane pê bike û stenderkirina zimên ne bi biryara kesekî û diduyane. Mijarek han divê, di navbera hemî zimanzan û rewşenbîr, danr û saziyên zimên yê hemî zaravan li hev kom bibin û gufûgo werin kirin, ku biryarek rast pête wergirtin.

Li ba hin miletan zaravek bêtirî ya din di nivîsandinê de bi karhatiyê û serdestiya wê kiriye. Ew jî, li gor nîr û sedemên wê zaravê di warên diravî (aborî) û kelepûra xwe ya rewşenbîrî, olî, civakî û konevanî de hatine. Aya dema dîrokî ya gelê kurd tê de dijî û zimanê xwe yê nivîsandinê hê nebûye yek. Divê berê hemî daner û rewşenbîr û dezgehên kurdî li nivîsandina yek be, yê hemî peyvên zaravên zimênê kurdî (soranî, kurmancî, zazakî...H.W.D.) di nivîsandinê de bi karwînin û di ferhengan kevin. Ji ber ku hê zimanê kurdî di astngê de ye û girêk li ber pir in. Ta roja îro bi du alfabêya dinivîsînî (Latînî, Erebî) li vir gelek pêwîste kurd tev bi tîpên latînî binivîsînî, ji hin sedeman:

- 1- Tîpên latînî dengdarên zimanê kurdî baş û zelal û nerim di nivîsandinê û lêvkinê de bi sane kartên.
- 2- Peyv ji hev dabeş na be.
- 3- Piraniya gelê kurd pê dinivîsînî.
- 4- Ji durvê tîpên cîhanî û serdest û şaristaniya nûjen ava bûye ve nêzîkin.

Ev li alîkî, li aliyê din yek rêbaz rêzmanî pê netê nivîsandin (Celadet, Qenatê kurdo, Reîdê kurd, Tewfîq Wehbê...) têkilî û hevgerêdan di navbera dezgehên û rewşenbîrên de kurde de çênabin.

Kirmanckî (Zazakî)

û Edebiyata Wê

Ji ber ku reşantiyek di derbarê Kurdên Zaza de li ba me gelekan heye; Me hêja dît ev gotara ku me ji malpera 'www.pen-kurd.com' girtibû biweşînin, hêvîdarin sûdar be.

Kirmanckî (Zazakî) ne ku tenê yek ji diyalektên

zimanê Kurdî ye, dibe ku kevintirîn zimanê Kurdan be jî. Lêbelê nisbet bi diyalektên din, a ku zêdetir bo nivîsandinê dereng ketibû û niha xetereya windabûna wê heye jî dîsan Kirmanckî ye. Ji lewre me divê her tim Kirmanckîyê aktuel bikin.

Di vê nivîsê de ez dê çend dîmenên vê diyalekta me ya qedîm raxînim pêş çavan.

- Aîdiyet

Dîrokzanê navdar Yaqûtî zêdetir ji heft sed sal beriya îro de dinivîsîne ku "Dumbilî" yan jî "Zaza" eşîrên Kurdan in. Yaqûtî li berhema xwe ya navdar *Mu'cemul AlBuldan* dibêje, "... Kelehên wan gelek pêt in. Kelehên Beşnewîyan û Bohtîyan û Zazayan digihêne hev. Kurdên ji eşîra Dumbilî (Zewwaz) zêdetir li çîyayên bilind dijîn..." Bi rastî jî Kurdên Kirmanckî ji qedîmî ve û hîn jî li zozanan, li çîyayên asê û bilind ên Kurdistanê dijîn.



Nivîskar: Roşan Lezgîn

Kirmanckî, yanî Kurdên Zaza xwe "Kird" ango, "Kurdên xas" dizanin û di hemû serhildanên mezin ên Kurdan de, bo numûne, Serhildana Mele Selîm Efendiyê Zaza ya li Bidlîsê (1910-1914), Serhildana Qoçgiriye (1920-1926), Serhildana Şêx Seîd Efendî (1925-1926), Serhildana Dêrsimê (1937-1938), ku ji bo avakirina Kurdistanê serbixwe bûn, Kirmanckî bi tevayî serî hildane û di vê dozê de her tim serkêşî kirine. Her wiha di hemû tevgerên Kurdeyatîyê yên di nîveka dawîn a sedsala 20. de û niha jî Kurdên Kirmanckî her aktîv in di nêv xebatên siyasî yên Kurdistanê de.

-Demografiya Kirmanckîaxêf

Kurdên Kirmanc texmînen li dora 3-4 mîlyon nufûs in û li sêzdeh bajarên Kurdistana Bakur ku niha ji alîyê îdarî ve di nav sînorên Tirkîyê de ne, dijîn. Ev sêzdeh bajar ev in:

- 1. Batman:** (li navçeya Hewêlê),
- 2. Bidlîs:** (li navçeya Motkîyê),
- 3.Çewlîg:** (li navçeyên Azarpêt, Bonglan, Çêrme, Dara Hênî, Gêxî, Kanîreş û Xorxolê)
- 4.Dêrsim:** (li navçeyên Çemişgezek, Mazgêrd, Pêrtage, Pilemuriye, Pulur, Qisle û Xozatê)
- 5.Diyarbakir:** (li navçeyên Çêrmûg, Erxenî, Gêl, Hênî, Hezro, Licê, Pasûr, Pîran û Şankuşê)
- 6. Erzingan:** (li navçeyên Îlîç, Kemalîye, Kemax, Mose û Têrcanê)
- 7. Erzîrom:** (li navçeyên Aşqe, Çad, Hesenqe, û Xinûsê)
- 8. Meletî:** (li navçeyên Putirge, Erebgirê)
- 9. Mûş:** (li navçeya Gimgimê)
- 10. Riha:** (li navçeya Sêwregê)
- 11. Semsûr:** (li navçeya Aldûşê)
- 12. Sêwas:** (li navçeyên Qengal, Zara, Ulaş, Îmranlî, Dîvrîgiyê)
- 13.Xarpêt:** (li navçeyên Depe, Maden, Mîyaran, Pali, Qovancîyan, Sivrîce û Xulaman)

Ji van bajarên li hinekan, bo numûne, li Çewlîg û Xarpêt û Dêrsimê pirranî Kirmanc in, lê li hin bajarên jî bes li navçeyekê yan jî li herêmeke piçûk hene. Li

derveyî van bajarên, li hindêk bajarên din, bo numûne, li Sariza Qeyserîyê, li Qirşehîrê, li Aksaraya Qonyayê jî beşek ji Kurdên Kirmanc (Zaza) hene.

- Navên Diyalektê

Ev diyalakta Kurdî çar navên xwe hene:

- | | |
|-------------------|--------------------|
| 1.Kirdkî. | 2.Kirmanckî |
| 3.Dimilkî. | 4.Zazakî |

Beşeke mezin ji Kurdên Kirmanc zêdetir “Kirdkî” kar tînin û xwe jî wek “Kird” didin naskirin. Li Dêrsimê jî “Kirmanckî” kar tînin û xwe jî wek “Kirmanc” didin naskirin. Beşeke hindik jî xwe wek “Dimilî” û zimanê xwe jî wek “Dimilkî” didin naskirin. Beşek jî xwe wek “Zaza” û zimanê xwe jî wek “Zazakî” bi nav dikin. Ji van navan peyva “Zaza” bi giştî ji derve de tê gotin, ango Kirmanc bi xwe vê peyvê zêde kar naynîn. Lêbelê ji ber ku peyva “Zaza” gelek hêsan tê bilêvkirin, niha bi giştî ji bo Kurdên Kirmanc ev peyv tê karanîn.

Di encama xebata standardîzekirina vê diyalektê de ji van navan “Kirmanckî” maqul hatiye dîtin û niha di warê nivîsînê de ev nav tê karanîn. Ger peyva “Zazakî” bête karanîn jî, rastir e ku wek “Kurdiya Zazakî” bête karanîn. Her wiha, ji bo diyalektên din jî ev awa navlêkirin bête xebitandin hîn rastir e. Bo numûne, “Kurdiya

Kurmancî” û “Kurdiya Soranî” û hwd. Ji bo civatê jî “Kurdên Zaza”, “Kurdên Kurmanc”, “Kurdên Soran” bêne gotin hîn rastir e.

- Ol (Ayîn/Dîn)

Meriv dikare bibêje ku nîvek ji Kirmancan Muslumanên Sunnî ne û nîvê din jî hema bi giştî Elewî ne.

Kirmancên Sunnî ku bi giştî xwe wek “Kird” û zimanê xwe jî “Kirdkî” bi nav dikin li çîyayên asê yên li navenda Kurdistanê, ji Motkîya Bidlîsê bigirin heta bi Aldûşa Semsûrê akincih in. Kirmancên Elewî jî bêhtir li jora bakurê Kurdistanê, ji Gimgima Mûşê bigirin heta bi herêma Qoçgiriye akincih in ku teqrîben navenda wan Dêrsim e.

- Taybetiyên Zimanî

Kirmanckî (Zazakî) nisbet bi dîyalektên din ên Kurdî taybetiyên zimanên kevnare hîn zêdetir di xwe de diparêze. Kirmanckî bi tevayî zimanekî zayendî ye. Hemû peyvên Kirmanckîyê nêr, mê û pirhejmar in. Hema bibêjin ku bi giştî peyvên Kirmanckîyê di halê xweser (halê sade) ê peyvê de jî zayend (nêrîtî û mêyîtî) û pirhejmariya xwe dîyar in. Heta ku di karan (fîl) de jî ev taybetmendî bi vî awayî ye. Çend îstîsna ne tê de, peyvên mê bi giştî bi dengê “e” diqedin û peyvên pirhejmar jî dengê “î” digrin. Bo numûne:

Pirs - Hejmar – 39 - rûpel -----5

Dar (nêr) . Dare (mê) . Darî (pirhejmar)

Îcar di Kurmancî de her sê nav jî di hala xweser ya peyvê de wek “Dar” têne nivîsîn. Lewre heta ku peyv di nêv hevokê de neyête xebitandin, di Kurmancî de meriv tê dernaxîne ku gelo ka peyv nêr, mê yan jî pirhejmar e, belam di Kirmanckî de peyv bi tena serê xwe jî taybetiya xwe dide nîşan. Ev taybetmendî qedîmî bûyîna diyalektê jî nîşan dide.

Ji aliyê koka peyvê ve jî texmînen heştê der sedî (80 %) bi dîyalektên din ên Kurdî re yek e. Ji aliyê forma peyvê ve jî Kirmanckî û Soranî û devokên rojhilatî yên Kurmancî ji hev re gelek nêzîktir in. Bo numûne:

Kirmanckî **Kurmancî:**
Serhed/Botan/Rojhilat
Binxet/Berrî

Verg Gurg Gur Hingimîn
Hingivîn Hingiv

Ji aliyê rêzimanî ve jî nisbet bi Kurmanciya Binxetê û Berriya Mêrdînê di navbera Kirmanckî û Kurmanciya Botan û Behdînan û Serhed û Rojhilatê de pêwendiyeye nêzîktir heye. Bo numûne:

Kirmanckî **Kurmancî:**
Serhed/Rojhilat Binxet/Berrî

Mi to ra va çi ?
Mi te ra go çi? Min ji te re çi got?

Lêbelê, li van salên dawiyê bi pêşketina Kurmancîya Berriya Mêrdînê û Binxetê, yan jî di encama nivîsandina li van salên dawiyê ku dûr ji zanîn an jî aşnabûna Kirmanckiyê pêk hatiye, piçek dûrahî ketiye navbera her du diyalektan. Ger nivîskarên Kurdî aşnayê hemû diyalektan bin dê zimanê wan jî bêhtir nêzikî hev bibe.

- Edebiyat

Di Kirmanckî de kevintirîn metna ku tê zanîn, kitêba Peter Îvanovîc Lerchî ye, ku ji devê hindêk camêrên Kirmanc (Kurdên Zaza) ên ku ji Nêrîba Hêneyê (Dîyarbekir) ne, li şerê Qirimê wek dîl ketine destê artêşa Rusyaya Qeyser, ev metn hatiye nivîsîn û di sala 1857an de li Petersburgê çap bûye.

Li welat jî, cara pêşîn metna ku hatiye nivîsîn *Mewludê Kirdkî* ya Seydayê Mela Ehmedê Xasî (1867-1951) ye. Ev mewlud di roja 25ê Adara 1899an de li Çapxaneyê Lîtografyayê bi alfabeya Erebi 400 nusxeyên wê li çapê ketine. *Mewludê Kirdkî* 16 beş û 756 rêzik e, her rêzik 11 kîte ye. *Mewludê Kirdkî* cara pêşî ji aliyê Malmîsanijî ve ji alfabeya Erebi transkîrîbeyî alfabeya Latîni bûye û li Ewropayê hatiye weşandin. Pişt re ji aliyê Mihanî Licokicî ve bo alfabeya Latîni hatiye transkîrîbekirin û di sala 1994an de li Stenbolê ji aliyê Weşanxaneyê Firatê ve ji nû de

çap bûye. Ev metn, ji bo Edebîyata Kirmanckî wek yekemîn metn tê qebulkirin.

Mewludeke din jî, ya muftiyê Sêwregê Mela Usman Efendiyê Babijî ye. Ev metn jî di sala 1906an de hatiye nivîsîn û pişt re destnivîsên wê dikevin destê Mîr Celadet Bedirxanî û ew jî di sala 1933an de li Şamê bi alfabeya Erebi çap dike.

Ji ber qedexekirina zimên a li Tirkîyê demeke dirêj bi vê diyalektê nehatiye nivîsandin. Her wiha, ji ber ku Kurdên Kirmanc bes li nava sînoren Tirkîyê ne, ji lewre li devekeke din jî bi Kirmanckî nehatiye nivîsandin. Lêbelê em li van salên dawîn pêdihesin ku li welat di salên 1970-80an de hin berhem di nepeniyê de hatine nivîsandin. Ji vana yek *Eqîdetu'l Îman* a Mela Mehemedê Mela Evdulxefûrê Hezanî ye ku li derdora Dîyarbekirê, bi taybet di nav melayan de belav bûye. Li wan deman Şêx Selaheddîn Firatî jî ji bo murîdên xwe broşurek bi navê *Beyatname* bi alfabeya Latîni nivîsandiye û bi nihênî belav kiriye. Dîsan, hindêk melayên din ên wek Mela Mehemed Elîyê Hunî, Mela Kamilê Puexî, Mela Mehemedê Muradan, û hindêk melayên din jî bi alfabeya Erebi mewlud yan jî qesîde û helbest nivîsandine.

Ji salên 1970an û virdetir di nav Kurdan de bi pêşketina siyasetê re îcar xwendevanên

mekteban dest bi nivîsînê dikin. Cihêtiyên di navbera kesên ekola mekteban û ekola medreseyan de ev e, ku ev ekola nuh zêdetir bi fehmeke siyasî-netewî tevdigere û alfabe ya Latînî ya Celadet Bedirxanî dixebitîne. Navdartirîn û çalaktrînê vê ekola nuh M. Malmîsanîj e. Ji bo Kirmanckî rola wî dişibe rola Celadet Bedirxanî ku di standardîzekirina Kurmancî de lîstibû. Jixwe, yekemîn metnên modern û her wiha yekemîn ferhenga Kirmanckî (Zazakî) Malmîsanîjî amade kirine.

- Xebata Standardîzekirinê

Bêguman çawan ku di Kurmancî de gelek devok (şîwe) hene her wisan di Kirmanckî de jî devok gelek in. Lê meriv dikare bi awayekî giştî Kirmanckiyê bike du devokên mezin:

1.Devoka Dêrsimê

2.Devoka Çewlîgê

Devoka Dêrsimê bi giştî Kirmancên Elewî pê diaxifîn û devoka Çewlîgê jî meriv dikare bibêje ku Kirmancên Sunnî pê diaxifîn. Îcar, ji bo standardîzekirin û aktualîzekirina Kirmanckî ji sala 1996an û bi vir de xebatên gelekî hêja têne kirin û ev xebat roj bi rojê bi awayekî bi îstîkrar her berdeham dibin.

Xebata standardîzekirina Kirmanckiyê li derveyî welat, li Swêdê di sala 1996an de dest pêkir. Deh-panzdeh rewşenbîrên

Kirmanc ên ji deverên cihê-cihê ku xwe wek “Grûba Xebate ya Vateyî” bi nav dikin, li ser vê diyalektê her berdeham dixebitin. Vê koma xebatê serê pêşî encama kombûnên xwe wek broşurê belav kir lê dû re kovara Vate derxist. Vê koma xebatê ta niha 14 car ji bo standardîzekirina Kirmanckiyê komî ser hev bûye û li dora 7.000 peyvan di formeke standard de tesbît kirine ku vê yekê pêşî li nivîsîna vê diyalektê vekirîye.

Di standardîzekirina Kirmanckî de ji krîterên hîlbijartin an jî tesbîtkirina forma peyvan yek jê ev e ku divêt diyalektan nêzî hev bikin, bo numûne, beranberî peyva “artık” a tirkî Kurmanc dibêjin “êdî” û Soran jî dibêjin “îdî”, di Kirmanckî de jî formên “hendî, hindî, hînî, hêdî, êdî” têne gotin. Îhtîmala mezin ew e ku di zimanê Kurdî de forma bingehîn “hendî” be. Bêguman di hemû zimanan de her ku çûye form siviktir bûye û di zimanê me de jî ev wisan e. Ji aliyê sivikbûnê ve forma “êdî” ji forma “hendî” siviktir e. Her wiha tercîhkirina vê forma sivikbûyî (êdî) di nêv diyalektên Kurdî de muşterekîyetê jî bi xwe re tîne û di warê têgihaştinê de hêsanîyê dide me, ji lewre niha Kirmanc jî di warê nivîsînê de wek forma standard êdî vê peyvê wek “êdî”, ango bi forma muşterek a Kurdî dinivîsînin.

Kovara Vate ku dengê vê komê ye û xwerû bi Kirmanckî derdiçe,

heta niha 26 hejmar jê derçûne. Ferhengeke Kirmanckî-tirkî û tirkî-Kirmanckî ku ji peyvên ku wek standard hatine qebulkirin û ji formên heyî yên din amade bûye, du car hate çapkirin. Ê kitêbek bi navê “Rastnuştîşê Kirmanckî (Zazakî)” ku di warê nivîsandina Kirmanckîyê de qaydeyên rêzimanî sererast dike jî ji aliyê heman komê ve hatiye amadekirin û weşandin ku ev encamên xebata standardîzekirina Kirmanckîyê ne.

Kovara Vate ji aliyê Grûba Xebate ya Vateyî ve di havîna sala 1997an de li Swêdê dest bi weşana xwe kiribû, ku hemû hejmar li welat jî çap bûn.

Ji derveyî kovara Vate, hema ji kovara Hawarê bigrin û bi vir de di gelek kovarên ku bi Kurmancî derdixin de jî her tim Kirmanckî hatiye nivîsîn û hê jî wisan e, her wiha weşanxaneyên Kurmancî jî cihêtiyekê naxînin navbera kitêbên Kurdiya Kurmancî û Kirmanckî. Lêbelê divêt mirov vê yekê destnîşan bike ku heçî Kurdên Kirmanc (Zaza) bin zû fêrî Kurdiya Kurmancî dibin yan jî di warê famkirina ji Kurmancîyê de zêde muşkuleyên wan çênabin, belam heçî Kurmancî bin, famkirina Kirmanckîyê bo wan gelek giran e, yan jî zêde xwe naêşînin ku ji Kirmanckîyê fam bikin an jî pê biaxifin. Ev jî ji bo Kurdan rewşeke nebaş derdixîne pêş ku Kurdên Kurmancî û Kurdên Kirmanc (Zaza) di xebatên komelaketî de yan bi axiftina Kurdiya Kurmancî

pêwendiyê bi hev re datînin yan jî ji bo têgihaştinê bi Tirkî biaxifin. Îhtîmal e sedemek jê ev be ku di encamê de her Kurdiya Kurmancî zal dibe, hingê qismek ji Kurdên Kirmanc xwe ji Kurdîtiyê bêrî dikin û doza “Zazacîtiyê” dikin. Bêguman qaydeyên Kirmanckî ji Kurmancî girantir in, ev jî dibe sedemek ku di warê famkirinê de ji bo Kurdên Kurmancî muşkuleyên hebin. Giranbûna qaydeyên rêzimanî jî, jixwe, wek gelek taybetmendiyên din şahidiya kevnarebûna diyalekta Kirmanckî dikin.

- Hindek Agahiyên Din

Weşanxaneyek bi navê “Weşanxaneyê Vateyî” ji sala 2002 û vir de li Stenbolê dest bi xebatê kiriyê ku heta niha 19 kitêbên Kirmanckî çap kirine.

Bêyî kitêbên telifî, gelek kitêb jî zimanên bîyanî bo Kirmanckî hatine wergerandin û her wiha ji Kirmanckî jî kitêbek bi navê “Sedefe” bo Swêdî hatiye wergerandin û du car çap bûye. Kitêbeke din ji vê diyalektê bi navê “Binê Dara Valêre de” jî bo Kurmancî hatiye wergerandin. Kirmancên xwe Kurd dizanin, heta niha zêdetir ji heştê (83) kitêbî çap kirine. Ji van kitêban çendên sereta naveroka xwe dînin ne, lê yên modern bi giştî edebî, dîrokî, siyasî û hwd. in. Kirmancên ku xwe ji Kurdan hesab nakin, xwe tenê wek “Zaza” dibînin û alfabekeke cihêtir dixebitînin, bêguman berhemên wan jî belav bûne.

Hevpeyvînek bi B.Rênas re

Pertewê Şerqî

Em li xwendevanekî kovara Pirsê bûn mêvan. Ew li navça Efrînê ji dayîk bûye û temenê wî derdora 67 sala ye. Ew ji 35 salan de bi amadekirina ferhengeke Kurdî mijûl e. Dibêj ku ferheng wî ji 40 hezar bêje pêk tê. Ji ber wilo, em gelekî bextewar in, ku em ev zimanhezî westan nas

bikin, û bi rastî ton karekî weha cihê serseknandin û spasîyê ye û eger ev ferheng rohniyê bibîne û were çapkirin, wê karibe pirtûkxana Kurdî dewlemend bike. Bi kurtî em dixwazin di riya vê hevpeyvînê re bi firehî li ser naveroka vê berhemê rawestin û mamoste nas bikin.

Pir. Tu çawa dixwazî xwe bidî naskirin?

Ber. Berî ku ez bi we re bikevim mijara axaftinê, dixwzim hindekî hûn destûrê bidin min ta ku ji vê hevdiînê re sipasiya xwe pêşkêşî we bikim. Bi rastî we bi vê serdana xwe kêfxweşiyek mezin di dilê min de çêkir û ez gelek ji we dilxweş û bextewarim, û carek din sipas ji vê seredana PIRS re, ev kovara ku niha cihê xwe di nav gelê me de bilind digre û ji me re bûye çavkaniyek sûdar.

nikane di çarçeva xwe ya sînorkirî de xwe ji gel re bide nasîn, bêyî ku tiştek ji aliyê wî de hebe û ew tişta jê re bibe sedema vê nasînê. Di vê riyê de, mebesta min xuya ye, ku ez destnîşanî semta pênuşa xwe dikim, ev pênuşa ku ez wê ji bo karguzariya gelê xwe terxan dikim û mejiyê xwe pê diwestînim. Ez bi hêvî me ku ewê min bi gel bide nasîn û ev karê min serkeftî be û berhema vî karî gelê min ji min pejîr bike.

Belê, bê guman, mirov îro

Pir. êwîstiyên amedekirina ferhengeke Kurdî li ba te çibûn?

Ber. Tiştê ku hîştî ez berê xwe bidin vê ferhengê û barê wê hildim ser milê xwe, pêşende evîna min ji zimanê min re. Di dû re, hezkirina gelê min û pêdiviya parastina zimanê wî yê ku dihêle em li gêtiyê hebin û navê me KURD bimîne. Û hewes û germasiya min ser wergirtina çanda

zimanê me yê Kurdî , ev çanda ku em li ser kaniya wê tîbûne, em dixwazin ava wê vexwin û xwe ji wê avê dagrin, ta ku em vê tîbûnê bişkînin. Bêguman mebesta min ji vî karî, ez şop û rêçeke xwe li pey xwe bihêlim, wîşma ku piştî dawîya temenê min ew ji bo min yadîgar bimîne

Pir. Ji ber ku dibistanên Kurdî li Sûriyê tunebûn tu çawa û kengî fêrî zimanê dayîkê bûyî ?

Ber. Birastî netê bîra min ez kînga fêrî xwendin û nivîsîna Kurdî bûme. Lê te bîra min ku ez hên di dibistana seretayî de bûm, ez hînî elfebêya Kurdî ya bi tîpên Latîni bûm, û dûre bi demeke ne dirêj, ez hînî xwendin û nivîsîna Kurdî bûm, ez karim bi bêjim, ku hîngê temenê min li derdora hevdeh an hejdeh salan hebû, û bi xwe di wê rojgarê de jî, ez hînî elfebêya Kurdî me yê Ermesitanê bûm, ewa ku bi tîpên Girîlîk yê Rûsî hatibû

sêwirandin. Ez bi xwe fêrî xwendin û nivîsandinê bûm .Fêrbûna min li gorî van herdu elfebêyên Kurdî Latîni û Girîlîk bi nêweriya wêneyên wan yê çapkirî bû, ewên ku li hin pirtûkxanên Ermenîyan li Helebê digel weşanên Kurdî bi nihênî dihatin firotin û min jê hinek bi dest xwe ve dixistin û jê hînî xwendina zimanê Kurdî dibûm . Bi vî cûreyî û bi palpişta xwe ez wisa fêrî nivîsa Kurdî bûm.

Pir. Tu dikarî jêderên peyvên ferhenga xwe ji me re diyar bikî?

Ber. Belê, lê di baweriya min de di karê amade kirina ew natên gotin, ji ber ku ferheng bi xwe biyaveke rewşenbîrî-zimanperwerî ye, ne biyaveke ekadîmî ye ku em bibêjin ew bi tiştên zanistî ve girêdayî ye. Belem ezê navên çend jêderên giring xuya bikim:

1-Ferhenga nûjen mamoste Elî Seydo Goranî.

2-Ferhenga msmoste Coys Joyce Blau.

3-Herdu ferhengên Soranî yek jê bi navê (Bilaw mamoste Fadil Nîzam dîn e bi Soranî û Erebi çapkiriye.

4-Ferhenga Jîn ya mamoste Muhemed Cemîl seyda.

5- Berhevoka mamoste ezîz Eqrawî.

6-Nivîştî meselok û xeberokêd cimeta Kurda, Heciyê Cindî.

7- Nivîştî zargotina Kurdan, Ordîxanê Celîlê Celîlî.

8-Herdu kovarên Celadet Alî Bedirxan Hawar û Ronahî.

9-Rêzimanê Cladet Alî Bedirxan.

10-Rêzimanê Reşîd Kurd.

11- Nivîştî giramêtîka Qenatê Kurdo.

12- Dîwana Mile Ehmedê Xanî.

Û ji weşan û kovarên Kurdî jî peyre bigre, ta em digihîjî axaftinên kal û pîrejinên Kurdan, her wisa weşanên televizyon û radyoyên Kurdî , dîwanên Cegerxwîn , helbest û belavokên Osman Sebrî, û hwd .

Pir. Taybetmendî û cudahiyên vê ferhengê ji yê din hene? Yan tiştine balkêştir tê de hene, eger hebin tu dikarî ji me re diyar bikî?

Ber. Hene, bi baweriya min be, tiştine gelek balkêş in, lê

gerek xwendevan bi hûrkî û saxbîrî li ser wan raweste ta

karibe taybetmendiya vê ferhengê ji yên din cuda bike û binêre ku ev ferhenga di kijan astê de cih digre, û di hindirê jiyana zimên de wê çi bandora xwe hebe? Ez di gotina xwe de pir dûr naçim, rûçikên cuda û balkêş ev in:

1-Ev ferhenga ji peyvên herdu zaravayên Kurdî Kurmancî û Soranî nihijiyê wek, ew pirojeyêke paşerojê ye.

2- Min ferheng ji peyvên biyanî nemaze yên Erebî û Tirkî çendî ku ez pê bi guman

dibûm parast, ango ew bi rûyê xwe yê Kurdî zelal ma

3- Min ferheng bi cûrekî zanistî dest pêkir, ez li ser peyvan radiwestiyam û min lê dixwend, eger ku peyvê mebesta xwe cih ne digirt, min ew ne dixiste ferhengê û pir peyv jî min bilêvkirina wan ya ne rast serest dikir. wek vê nimûnê: Delal, dil – al û pey re rastiya xwe dilal e.

4- Piştî min peyvên Ferhengê bi Kurdî şirove kirin di nav re min pir peyv bi Înglîzî jî palpiştîkirin ta ku mebesta peyvê rind bihête mêlagkirin .

Pir. Asteng û Sedemên derengiya weşandina vê ferhengê ta roja îro çine?

Ber. Min xuyakirî ku medara min ya diravî di vê

pirsa wisa de arîkarî min nake, loma ev berhema min ta niha nehate çapkirin .

Pir. Fêrkirna zimanê Kurdî stubarê her zimanzanekî ye, eger ji te were xwestin tu amdeyî şagirtan fêr bikî ?


Ber. Belê, bê guman ev ji min re rûmetek mezin ku ez fêrkarê zimanê gelê xwe bim.

Pir. Agahdarî û bangên te ji hemû xwendevan û nivîskarên Kurd re çine

Ber. Banga min ji bo xwendevan û nivîskarên Kurd ev e: Ku ew li rewşa gelê xwe binihêrin, gelê me ji ber egerên civakî, çandeyê, aborî û siyasî, bandûra gelên ku em pêre dijîn li ser gelê me dibe û ew bêçar dimîne ku bi zimanê wan bide û bistîne, ev dan û standina bargiraniyeke xwe dide ser zimanê me û zimanê me ji ber xizan dibe û berve windabûnê diçe. Ji lew re û ji tirsê vê yekê re, divê em girîngiya xwe bidin ser vê pirsê û bi bîr û pilîmên xwe gelê xwe ji terkizîya vê rewşê biparêzin berî ku dem di ser me re derbas dibe û em poşmanî dibin.


Gereke hemû xwendevan û nivîskarên me xwe terxanî parastina gelê xwe bikin, nemaze di çarçêva zimên de, ji ber ku ziman tiştêkî gelek giring e, wek ku dibêjin : Ew nasnama gel e , eger ku ew winda bibe gel jî pê re winda dibe. Lewre, ji bona vê yekê, sipara yekemîn em ji hindirê mala xwe de dest bi parastina zimanê xwe bikin, bi agehdarkirina zaroyên xwe an xûşk û birayên xwe, daku nirxa zimanê xwe zanibin û zimanê Kurdî yê şîrîn ji bargiraniya zimanê biyaniyan biparêzin, em dikarin wan fêrî xwendin û nivisîna Kurdî bikin û wan bi zimanê gelê xwe bidin hezkirin.

Li dawîya vê hevpyvînê em zor zor spasî B.Rênas dikin û daxwaza me ew e ku ev ferhenga rohnîyê bibîne û bê derengî çap bibe û gelê me sûtê jê bibîne.



MEM û ZÎNA Ehmedê Xanî

(2/4)



Rizgar Kurdaxî

• XANÎ di nakokiyeke beloq de

Lê di van malkên jêrîn de, em dibînin ku Xaniyê me yê musliman xwe dide aliyê Iblîsê ku limêj ji adem re ne kir û fermana Xwedê nebihîst.

Bi rastî ev nakokiyeke diyar û belûq e, Xanî çavên me lê vedike, çawa ku Xwedê ew ji roniyê çêkir û Adem jî ji av û kîlê çêkir û ew dê limêjê ji Adem re bike.

Ya din, Xwedê bi xwe gotiye, divêt tenê win ji min re limêjiyê bikin, çawa dibêje melaykan(firîşteyan) nimêjê ji Adem re bikin, Xanî dixwaze vê nakokiyê zelal bike û bîne zimên, lê bersîvê dihêle ji xwîneran re.

Lê bi bîr û baweriya me, Xanî ev malikên jêrîn ne ji bo Îblîsê rast nivîsandine. Ewî ji me Kurdan re nivîsîne. Wek çawa ku mirovekî Kurd di saziyekê de kar bike, xebatê bi şev û rojan bike, û piştî demekê ji xebata wî, ji ber sedemine curecur ew neçar bimîne ku kar berde û hinek din rabin karê wî bikin. Dev ji saziyê berde belkim ji sedema nexwaşbûnê yan.. yan.. !? Û divê dîrok û xebata wî kesî bête jîbîrkin û reş bête boyaxkirin, ger nebêjin bûye filan an bêvan..??? Yanê wekî ku herdem keda mirovî wandayî be û sipasbûn tune be:

Iblîsê, feqîrê bêcinayet
Her roj dikir hezar ta'et
Wî secde nekîr li xeyrê me'bûd
Yek secde nebîr li pêşê exyar
Elqise ji hîkmeta te agah
Zanan telebî xudan îdrak
Xanî bi nezaniya xwe de heqê

Hindî te hebû digel inayet
Lewra ko te da wî istita'et
Kir te ji ber deriyê xwe merdûd
Qehra te kire muxellide nar
Ferdek me nedî tebareke Elah
Der heqê te gotî: Ma erfnek
Gomrahî bibêt ne dûre elheq

Gomrah: Wundayî, nezan. Xudan îdrak: Pêximber

• **Qêrîn, gilî, gazî û kela dilê XANÎ**

Ehmedê Xanî bi dilekî şewitî û çavên tijî histêr û girî hawaran dike û waha girîniya xwe bi zimanekî helbestane daxive herwaha Xanî hal û rewşa milletê xwe daniye ber çavên xwe, paşmayîna Kurda bi nirîneke konevanî dinirxîne, wê rewşê dike erik û situbariya axa û began û wek serok û rêberên îroyînu lavêjan ji xwe diweşîne.

Ehmedê Xanî bi xwa şoreşek bû, ango ne şoreşvan an şoreşger, na ew bixwa şoreş û ceng bû.

Ala serefirazî û serbixwabûnê bilind kiribû, û digot: Em jî miletek in, em jî xudî ax, ziman, dîrok û netewak in, vêça divêt em jî xudî dewlet bin.

Lê pirî çaran jî, li têla tembura nelihevkinê dide ta ku Kurdan şiyar bike, ji xewa giran xewa nelihevkinê û perçebûnê xwazî bitenê çarekê wan şiyar bike, lê ew tim bê pêkanîna wê hêviyê mabû, ta roja ku çav damirndin û ji nava Kurdan barkir.

Herwaha xanî nedixwast zêde bi ser Kurdan de bibase, carina dibêje ku Xwedê em wîsa dane, lê çira Xwedêyo tu li me waha dikî, gelo em ne liyaqî welatekî ne !?

Gelo çira te em sêwî û bêkes ji dayîk dan!?!? Bila bersîv a xwîneran be

Saqî tu ji bo Xwedê kerem ke
Da cam bi meyê cihan-uma bêt
Da keşf bibin li ber me ehwal
Qet mumkîne ev ji çerxê lewleb
Rabêt ji me ji cihanpenahek
Ger dê hebûya me serfirazek
Ger dê hebiya me padîşahek

Yek cureyê meyê di camcem ke
Herçî me irade ye xuya bêt
Kanî dibêtin muyeser îqbal
Tali' bibitin ji bo me kewkeb
Peyda bibêtin me padîşahek
Sahib keremek suxen-newazek
laiq bidiya xwidî kelahek

Te'yîn bibûya ji bo wî textek
 Hasil bibûya ji bo wî tacek
 Ema ji ezel de Xwedê wîsa kir
 Pirsî ji dinê min ev bi hîkmet
 Ez mame di hikmeta xwidê da
 Aya bi ci wechî mane mehrûm
 Lew pêkve hemîşe bêtifaq in
 Ger dê hebûya me ittifaqek
 Tekmîl dikir me dîn û dewlet
 Rom, Ereb û Ecem tamamî

Zahir vedibû ji bo me bextek
 Elbete dibû me jî rewacek
 Ev Rom û Ecem li ser me rakir
 Mehra te çiyê gote min ko hîmet
 Kirmancî di dewleta dinê da
 Bilcumle ji bo çî bûne mebkûm
 Daim bi temerud û şîraq in
 Vêkra bikira me inqiyadek
 Tehsîl dikir me 'îlim û hikmet
 Hemîyan ji me re dikir xulamî

Saqî: Meyîger

Camcem: Piyala Cemşîd padîşahê fîrsa. Cîhan-numabêt:
 Cîhanzelalker.

Îqbal: Şansa rind. Cihanpenahek: Rizgarkarê gerdûnê

Suxen-newazek: Zimanxwaşek. Çerx: Felek. pêkve: Pevre.

Hemîşe: Giş, hemî. Inqiyad: taeet, gulêkirin, guhdan.

Namdar: navdar \ serkêş. Tawan: Sûc. Rûs:teezê.

Pêkve: Bi hev re\pevre. Hemîşe:Giş\hemî.

HerwEha Xaniyê gorbihuşt li ser zimanê Zîna çeleng daxive, diqîre
 û dibêje, ku felek û aso hertim bi me Kurdan re xayîn û xiniz e,
 daxive Xwedê û dibêjiyê, te dewrek ji me re nekir, serfirazek an
 azadiyek, layîq nedîn, te serbestiyek ji bo gelê min ê jar û perîşan
 neda, gava dibêje:

Dewrek te nekir demek ji bo min Pir dî te Memek ji bo min

li ser ezeziya serkêşan jî dinale, ew ezîtiya qirêj, genî û pîs, gava
 dibêje:

Bilindiyê ji xwe ra dixawzêt Sufliyê ji me re nîhan dixwazê

Fermo em pevra van malkên jêrîn bixwînin:

Mehra felekê ji ezel de edîme
 Herçî we go ji erdê raket
 Bilindiyê ji xwe ra dixawzêt
 Nabînî ko her-roj avtabî
 Xasima ko digel qebîlî aşiqan
 Elbite dilî me aşiqî bazan

kîna felekê ebed qedîm e
 Elbete ewî di erdê daket
 Sufliyê ji me re nîhan dixwazêt
 davête mixareta turabî
 Him xayîn, xar û him minafêq
 Ewel dibêtin bi xenc û nazan

Pirs - Hejmar – 39 - rûpel -----16

Axir dikêtin melûl û meyûswekî	Memê zelîlî mehbos
Davête mehbesê bênakam	Datîne merqedê bêserencam
Herlehze digo çerxî dewar	Eyî zalimê bê eman û xwînxwar
Min qesid û xered digel te nîne	Aya te digel min ev çi kîne?
Dewrek te nekir demek ji bo min	Pir dî te Memek ji bo min
Nûrek di riwê min kir te peyda	Sohtin li Memê te pê sewda
Şewqek di roxê Memê te hilkir	Qelbî min bi wê te sohit û kul kir
Ew te waha li min eyan kir	Paşê te çira li min hinda kir
Sohtin te em bi agirî firaqî	Kuştin em bi derdî îştiaqî

• **Guyana netewî li nik XANÎ**

Xanî li ser destana Memûzînê radiweste û dixwaze bi xwe wê binerxîne

Lê ya rast ew ne destanê dinerxîne, ew dixwaze bêje ku wî bi Kurmancî ew nivisiye û wê demê wî dikanî ku bi Farisî, Erebi û Turkî binivîsanda, lê Kurdî vebijart:

Safî şemirand foxwarê durdî	manendê durê lisanê Kurdî
Da xelik nebêjin ko Ekrad bê	merifet in bênijad û binyad

Ta ku zimanî Kurmancî jî derxe holê, dibêje bila wê pîs nenerxîne, ji ber ku bi Kurdî hatiye nivîsandin. Na, bila wê bi di wateyên wê de binerxînin. Ango: bila rexnegir jê re ne tixumperest an nijadperest bin

Ev name ger xirab ger qenc e	kêşaye digel wê me dused renc
Nobare ye tîfle norsîd e	Herçend ne hîn qewî gezîd e
Norestê gulistana yî fuad e	Bêguneh, nazlê û xanedan e
Nobar e ger şîrîn ger tal e	Xwaş e ji rengê etfala ye
Min hevî heye ji ehlê halan	Teqbîh nekin evan tifalan
Ev meywe eger ne şîrîn e	Kirmancî ye, ew qeder li kar e
Ev tifle eger ne nazelîn e nobar e	Bi min qewî şîrîn e
Ev meywe eger ne pir lezîz e	Ev tifle bi min qewî ezîz e

Name: Pîrtûk, destan. Renc: zor, westan. Nobare\norsîd: Fêkiya teze

Gezîd: Baş, rind, dilkê

Xanî xwastibû vê çîrokê bi zimanê kumancî binivîse, û sedema wê jî, ango bersîva pîrsa çira wî wergî xwastibû jî di helbestên jêrîn de diyar in, di vir de em guyana netewî li nik Xanî dibînin, wî dikarî bi zimanên Turkî, Farisî yan bi zimanê Erebi ev destana binivîsanda, lê wî zimanê xwe yê zikmakî da pêşiya hemo zimanan, ji lewra jî ew

Kurdperwerekî zor hêja ye û şervanekî bêrawestan e ji bo pêşxistina zimanê Kurmancî.

Herwaha ew dibêje, ku kurmanc ne cahîl û nezan in lê bêkes û bêxudan in:

Filcumle ne cahil û nezan in

Belkî di sefilit bêxwadan in

Û dizane ku gelên derdor ji wêjeya Kurmancî gelek tişt dizîne, ji lewra jî helbestvanên berî xwe tîne zimên û bîranîn, ta pê bicespîne ku kurmancan ji berê de helbest nivîsîne û xudî tore ne...

**Binve riha Melê Cizîrî
Keyfek we bida Feqiyê Teyran**

**Pê heyî bikira Eiliyê Herîrî
ta bi ebed bimaya heyran**

Dîsan diqîre û dibêje:

Ger dê hebtya me jî xwidanek

Alî keremek letîfe danek

Ango : Bila yê me jî heba xudanek û piştgiriya zimên û toreya Kurdî bikira ,hîngê me yê ziman pir û pir li pêş xista, lê biborînin hîn em bi zimanine dîtir dinivîsin daxivin û dixwînin!??

Eger em dîroka wêjeya Kurmancî birûpelînin, emê bibînin ku berhemên wêjeya me bi çar zarawan hatiye nivîsandin, ew zarawe jî ev in : Lorî, kurmanciya bakur, goranî û soranî, yekemî zarawe jî ya lorî bû.

Lê Xanî bi Kurmancî destana xwa ya zêrînî ya Memûzînê nivîsî bû . Herwaha ew di destanê dibêje

**Safî şemirand foxwarê durdî
îrane nîzam û intizamê
Da xelik nebêjin ko Ekrad bê
Hem nebên ko Kirmanc
Kirmanc ne pir di bêkemaal in
Fîlcumle ne cahil û nezan in
Ger dê hebtya me jî xwidanek**

**manendê durê lîsanê Kurdî
kêşaye cefa ji bo wê amê
merifet in bînijad û binyad
Eşiq nekirin ji bo xwe amanc
Ema di yetîm û bêmecal in
Belkî di sefilit bêxwadan in
Alî keremek letîfe danek**

Durdî: Cureyeke ji cewherê giranbûha û binerx e. Manend:Nîmune (mîsal). Amanc: Armanc, daxwez. Yetîm: Bêkes, bêxudan

Xanî dixwaze bêje, baxive û razên dilê xwe biderîne, lê ew ji sedemine nediyar(belkim ji tirsê hakimdaran be jî, lê ev ne sedemeke

rast diyar e. ev nirîna min e. lê biqasî ku dijmin hertim zimanÊ me qedexe dikan wî dixwast serxwûş bibe pêra çen rastiyan baxive— Rizgar Kurdaxî) dixwaze bi meyê gelekî serxwaş û mest bibe ango: Teles bikeve pêra biçe nava dost û hevalên xwe, û ji wan re binale. Lewra dibêje meyîfiroşan kanî bila piyal li pêş min her tim dagirtî be, wê ji min bidûr mexin, ta ku ez ji we re gotinên cewherî bêjim. Ta ku pê va dilê agirpêketî bihênikînim û aram bikim ???

Saqî bike camî esimanî	Roha we go canî cawdanî
Da em bikin dimaxê can ter	Yek lehze bi meyê canî perwer
Saqî tu birêje camê mîna	Ava ku dikit demîrî bîna
Şadî bikira qelbî mehzûn	Medhoş bikira eqlî mecnûn
Saqî bike kaseya micewher	wê şîrî mueserî paqijker
Durtene yî xwe birêje navî	Yanê meya wekî gulavî
Dem dem bide destê meyperestan	Xelqê ko hinik ji dîl di destan
Yanê bikêfte canî şewqek	Heta bighête qelbî zewqek
Sed xunce yî dil jiber bikeribin	Sûsin biziman û bixeber bin
Bişkuj bipişkivin ji xaran	Xwînrêzî bibin dûvî hezaran
Saqî bide min şerabî gulgûn	Bê dengî def û sedayê qanon
Teşwîş biçin ji qelbî mehzûn	Dîsan bibim ez ji nû digirgûn
Mexmor bibim bi kalamê lafan	Serxwaş bibim bi kalamî guzafan
Bê keyîf neşîm çi ez bêjim	Dîwane bibim duran birêjim
Bedhal bibim siran biderdim	Bêqal ji batinî xeber dim
Bêdeng ji xordil bê aheng	Sedrengî seda bidim wekî çeng
Şerha xemî dil bikim fesane	Zînê û Meme bikim behane
Nexmê waha ji perdê derînim	Zînê û Memê ji nû vejînim

Roha: Meyî. Canî: Guyan. Durtene: Tenên lolo. Dem dem: Hinek hinek.

Cawdanî: Nemirtî (xilud). Xune: gupik. Bişkuj: Gulgupi, gupikê gulan.

Xaran\xar: Stiriye tayî gulê. Xwînrêz: Rondikên xwînî. Hezar: Bilbil. Gergun: Dilnearamî, xemxwarî. Lafan: Gotinên 'am. Neşîm: Nikarim.

Xordil: Kuftê dil, hundir dil.

Xanî jî weke hemî kilasîkên Kurd peyvên ne bi Kurdî bi kar anîne, lê ew peyv jî li gor rêz û rêçikên zimanî Kurmancî bi kar anîne:

Kurdî, Erebi, dur û tazî

Terkîb kirin bi lez û bazî

spas

Wolfgang Borchert

(1921-1947)

Werger û amadekirin. Tengezarê Marîni

Di 20ê gulanê sala 1921an de, li **Hamburgê**, ji dê û bavekî rewşenbîr bûye, temenê wî 15 sal bû dema dest bi nivîsîna helbestê kir.

Di sala 1939an de, dest bi xwendina dersên bazirganiya pirtûkê kir, lê piştî salekê xwendina xwe birî û dest bi vekirina kursên ekteriyê kir. Di vê salê de cara pêşîn helbesteke wî di belavoka „Hamburger Anzeiger“ belav bû.

Ji ber hezkirina **Wolfgang Borchert** ji şanoyê re, bû ekterekî zîrek, û di sala 1941an de, li Hannover-rojhilat, li ser textê şanoyê lîst, piştî şanoya gerok avakir û li Lüneburg kar ji bo xwe dît. Ev

dema kurt, ya herî xweş bû di jiyana wî de, wek wî nivîsîbû, lê mixabin li wê salê di heyva Cehzerê de çû xizmeta leşkeriyê.



Di sala 1942an de, di şer de birîndar bû û bi êşa Defteriya ket.

Borchert, gelek derbirînên li dijî cengê dikirin, lewra hate girtin û li Novemberê avêtin eniya rojhilatê, lê ji ber nexweşiya wî û gumana nexweşiya zerikê, li sala 1943an ji leşkeriyê azad kirin. **Borchert** di sala 1943an dubare kete zindanê, ji ber ku

ew wek lîstikvanekî kabaretîst lîst û yariyên xwe bi Joseph Goebbelsê ku wezîrê ragehandinê di demê Hitler de bû, kirin.

Di sala 1944an de, 9 mehan li **Berlînê** kete zindanê û hukum wek dijminekî pêhat. **Borchert**, li Ferensa hatibû dîlkin, lê di sala 1945an de reviya, ew pir nexweş bû, lê dîsan li Hamburg mîna al Regîassistent li Hamburger Schauspielhaus karkir.

Yekemîn berhem ya **Borchert** ya helbestî, di sala 1946an, bi navê "**Çira Şev û stêr**" ku helbestên wî yên di navbera 1940 -1945 weşand.

Borchert ne tenê helbest nivîsiye û ekter lîstiyê, belê kurte-çîrok û çîrok nivîsîne, jê, çîroka wî ya bi navê «Gula kûçik». Babeta vê çîrokê, çarenûsa mirovan di şer û piştî şer de diyar dike.

Di çirya paşî sala 1947an de, di gel ku **Borchert** bi nexweşiyê giran ketibû û zanîbû jê rizgar nabe, di hundurê heftiyekê de, drama xwe ya expressiyonistî ya bi navê „Li derve, li ber dergeh“ nivîsî, ew bêhtir jiyana wî bû, ango leşker piştî şer vedigere welatê xwe, lê di şerpezetî, tenêti û belengaziyê de, temenê xwe dibhurîne.

Berhema wî ya dawî di jiyana wî de ku hatibû weşandin bi navê «Di rojê Sêşembê de (1947)» bû.

Wolfgang Borchert di 20. November 1947, li Basel wexer kir. Piştî mirina wî bi rojê Drama wî li **Hamburger Kammerspiel** hat lîstin.

Di pey wexerkirina wî re berhema wî ya nehatibû çapkirin, bi navê „**Tolgînên xemgîn**“, di sala 1962an de, hate weşandin.

Ramîsan

Baran dibare – erê ew hest nake,
Ji ber dilê wê ji xweşbextiyê
dilerize:
ramîsan cîhanê di xewnê de

dixendiqîne.
Kirasê wê şil û qermiçî ye
Wisa bêagahdarî bi jor ve
hilkişiya ye,
mîna paqên wê bo her mirovekî li
wir be.
Pizrûkê baranê, yên ne ji bo
tişteki firfirîn
tiştê kesekî nedîtibe, dîtibû,
Wisa giran hîn agah lê nebû -
giyanekî bêwate pêdivîye lawir
weha bin!
Pirça wê mîna kaxezek pîroz
berba bûye -
çira tevna xwe tê de dihûnin..

Strana evînê

Ji ber niha dê şev bêt,
ezê li nik te bimînîm.
Ez dikaribim bo te çend bim,
dê bidime te!
Qet pirsê ji min neke:
Ji kû û bi kû ve -

Pirs - Hejmar - 39 - rûpel

evîn dê min bibe,
min bi tevayî bibe wir!
Bibe, şeveke dirêj bo min
nazdar bo min.
ji ber tenê şevê
dê li nik te bimînîm.

Bizavê bike

Xwe têxe nîva baranê,
behweriyê bi pizrûkên lêbuhurînê
bike,
tevna xwe di xirûcirê de bihûne
pêkolê bike baş bî!
Xwe têxe nivê bayê,
pêbehwer be û zarok be -
rê ji bagerê re veke bo derbasî te
bibe
pêkolê bike tu baş bî!
Xwe têxe nîva êgir -
hez ji felaketê bike
di dilê meya sor de
pêkolê bike baş bî!

Xatirxwestin

Maçek bû liperavê –
derbas bû.

Xurîna sûlavê û derya berbi te ve
dajo.

Û roniyêke sor û yek kesk
xwe dûr dikin...

Baran

Mîna pîrejinekê diçe
Bi xemgîniyêke bêdeng di welat
re.

Pirça wê şil e, matoyê wê
gewir,
carnan destê xwe hildide

Bi dilsarî li cama pencerê dixê,
cihê ku perde bi dizî pist-pistê
dikin.

pêdiviyê keçik li mal bimîne
belê îro weha jiyaxweş e!

Ba pîrejinê ji porê zeft dike,
û rondikên wê dibin lekeke kovî
ye .

((Verwegen läßt sie ihre Röcke
fahren))

û semayê dike cinîtî mîna pîra
seherdarê!


Helbest

Gul bi narînî weha sor geş dibe,
Gul bi comerdiyêke mezin di ber
de şîn dibe.

Gul bi narînî jiyan e,
gul bi comerdiyêke mezin mirin
e.

şêrîn û miz e jiyan,
miz kêf e û şêrîn tengasî.

gula jîndar weha sor geş dibe–
gula mirî şîn di ber de geş dibe.



Desmaleke Hevrîşmî me

Fatma Savci - Istembûl

Ez desmaleke hevrîşimî me,
li hemî sûkên qaçaxçiyên.
Diya min, bi nav sînoran keti
bû, ez ji binxetiya xwe peyde
kiri bûm.
Heya gihijandi bûm vî emrî ji
çardeh gumrikan bi dizî
derbas kiri bûm.
Nayê bîra min ku kesekî ez li
dawetan dam serê xwe.
Yan jî sergovendan di dîlanan
de ez hejandim.
Ku dilobêj digotin, ji dêvla
şînî û hewariyekê, davêtim ser
porên xwe.
Nizam, di rûyê min re çi
didîtin, keçikên ku cinan li ser
evîndarên wan xwendî bûn û
cardî venegeriya bûn ji
çolan...
Hemî qîzan xwe dikirin yek,
hestirên çavên xwe bi laşên
min zuha dikirin...
Lê tîna wan ne dişikest, bi ser
halan de, dilê xwe ji min re
dixwendin. Ku min çavên xwe
digirt ji bo nebînim, kulên
xwe hemî bi ser min de
diweşandin.

Radibûn ez wekî hêviyekê, bi
dara xweziyan a mişayixên
gundê xwe
ve dikirim.
Niha, hêleke
min çemekî
ji rondikên
çavên
keçikan, wan
xezalên
birîndar e.
li bin dara xweziya diherikim.



Her desmaleke hevrîşimî bûm
ez.
Dildarên ku li zemanên
qedexeyiya evînan dijiyan,
wekî nepeniyeke nedîtî,
ez diyarî hev dikirim.
wekî helbesteke ku bersivên
hemî pirsan tê da bin.
Mîna wateya ku di cewherê
hemî evînan de şax dabin.
wekî morîkên kehrîbar ku ji
heft dapîran mabin.
mîna xencereke ku heft
bavikan ji boyî hev mîrat hişti
bin.
Ez xelateke maqûl û xweşik
bûm ji bo hêvîdaran...

Di nava dilobêjeke ku navê
wê kurdistan e de, bi kêrî tu
karî ne hatim.

Min tenê çavên kuştîyên ku li
benda rizgariyekê diman
nixwimand...

û birîndaran xwe li min digirt.
Ez li ser birînên xwe girê
didam.

Hînî hemî zimanê birîna
bûm. Fêrî êş û têkçûyinên wan
bûm.

Birîndaran ez bi jan û çîrokên
xwe gûhastim...

Niha birîneke kûr im ez.

Birîneke qerase ku bîn, deng
û nalîna welatekî jê tê...

Birîna egîdên çîrokên nivçe
mayî, birîna efsaneyên me
teva me...

Dilê min mûmdankeke kevin
e, birîn tê da agirekî volkan e...

Kî zane, belkî rojekê dildar
werin, wekî bilbilên serfiraz,
evînen xwe yên azadkirî, li
ber dilê min bixwînin.

Ji pêkenokên rast

Li gundekî ji Çiyayê Kurmênc ji herêma Mabeta. Xortekî ciwan,
nuh ji leşgeriyê vegehbû mir. Şênîyê gund tev li dor laşê xort kom
dibûn. Yê dibihîst wê mirinê pir hukarî lê dikir û gelekî ber diket, ji
ber ku, hê ciwanî bû û zirar û zîyan ne gihêtibû tukesî, dost û hevalan
û mervên xwe bi girî ser de dikuştin. Dengê giriyê wan zemîn û
ezman diqelişand. Hinan çav li tabûtê diketin û hildidan ser piya û bi
dengê bilind digotin: Pêxemberê selawet, Mihemed mistefayê
selawet,... Bi van dirûşmên olî, xort diketin bin tabûtê û cîhê xwe
diguhêrîn û dimeşîn û şênî li pê wan rêz dibûn lavj û fatihe ji giyanê
wî re dixwendin, ta digihêştin ser mezê û tirbe hatî kolan. Mile
(xoce) tabût dida pêş xwe û şênî li paş wî bi ser de nimêj dikirin.
Tabûtê li ber devê gorê datînin ku lêş ji bi derxînin. Devê tabûtê
vedikin çî bibînin ! Valaye. Xelkê li wir tev şet mêt diman . Ev
candek (laş) kuve çûye ? Mile digot: Ev ciwan di jiyana xwe de tu
guneh û tawan nekirine. Ev mîna firişta ye. Ev pakrewane, ji tabûtê
dektî firiye. Xelkê li wir hinan bawer dikirin û hinan bawer ne
dikirin. Yê bawer kirin û bawer ne kirine, di çala sêtiyê wer dibûn û
şênî li ser mezê belav dibûn. Xwediyê mirî li mal vedigerîn, hê laşê
miriyê xwe li hundir ser têxte.

Pirs

Erê Efrîna min

Cobarên xemgîniyên te
di bin lehiyên nalînên
dayika te de,
di newalên dilên me de
sêlroyekê bi firmêskên
zarên tazî,
bahozên bin lingên
dayikên pakrewanên
bajarê min
helbestên serxweş
dirêstin .

Cobarên xemgîniyên te
di rêyên çalexwarî de,
bi qaserî stêrkên ezmana
Zîna min
pêrgî darên sindiyanê,
zeviyên zeytonan tên.

bi hev re bi zimanê
"Çiyayê Kurmênc"
li ber pêlên çema "Arasê"
ya ku rojekê ji rojan
qehremanên Kurdistanê
li pişta xwe mîna fireşteyên,
dilên cangoriyan sîwar kiri
bûn,
û li ser destên şaxên bînbuharî
de
rwaestandin.



D:Ebdlmecît Şêxo

Cobarên xemgîniyên te
di ber tîrêjên çavên
jineke Kurd re diherikîn,
rûyên xwe bi sê rengan
di eniya "Çiyayê Lêlon "de
çandin
û çend rûpel ji dîroka kela Horî
ji balêndên dilên
cegerşikestiyên re
xwendin .

Cobarên xemgîniyên te
di nîva şevê de
li deştên bêhnjenimî,
bêhnhenarî,
bêhnmêwên tirî
rastî govendên kotirên
basik birîn
hatin.

Cobarên xemgîniyên te

bi dilopên jinebiyên welatê min
 re
 bi serbilindî ji xwe re
 mîvanxaneyekê di devê hêvê
 de
 ava kir .
 Cobarên xemgîniyên min
 xwe bi hilmên mindalên
 "HELEBÇE"
 li ber bendergeha çavên bêzar
 şuştin .
 Cobarên xemgîniyên te
 seqamên li ser piştên
 nûgihayên me
 berfên li ser sînga destanên
 welatê min
 herifandin
 û rodankên nûh ji xwe re
 bi dîdema stêrkan ava
 kirin .
 Cobarên xemgîniyên te
 Siruda "Ey Reqîb" ji xwe re
 kirin pîrozgeh,
 rengên xwe bi ava kaniya
 "Basûtê"
 bi kenîna "Ednanê Cindo"
 bi limêjên wî li ser miriyên
 bajarê xwe
 dişuştin.
 û di ezmanê keçên Efrînê de
 fîreştayên dilên xemgîn
 tîmar dikirin.
 Cobarên xemgîniyên te
 .

Îro hêştin ku keskesor
 bi rondikên xwe awênan
 Ji dîlbera min re ava bike.
 Cobarên xemgîniyên te
 bila îro di 10 nîsanê de hestên
 xwe
 bi şabûna Loriya ya rizgarkirî
 bi rondikên bê guneh
 xwe aşle bike
 û bila çûkên çavên te
 cîrokên dê û bavê di şevên
 zivistanê de
 ji gulistanan re bixûnin.
 Cobarên xemgîniyên te
 bila di nav pêsîrên dayikan de
 bi kenîn û giriyên sirûştâ
 deştên genimî
 hêrên henaran
 hêlanên pîrozî
 çê kin .
 Cobarên xemgîniyên te
 dê rojekê li ber bayên lingên
 dapîra min
 û di nav lêvên girê "Endarê" de
 HÛR, HÛR BIBIN.
 Erê EFRÎNA min
 Erêê ê

*-Tuttlîngên,15.04.2007

*- X. Loriya: Navê keça min
e

Zimanê gunehiyê

Edonîs

*Kelepûra xwe dişewtînim
Dibêjim zimanê min
Nuxurî (*) di ciwaniya min de, tirbe nîn
Di ser xwedê û ehrîman re derbas dibim
Riya min ji riya ehrîman xwedê dûrtire
Di nivîsara xwe re derbas dibim
Bi mewkîba birûska ronahî
Bi mewkîba birûska kesk
Bang dikim bihuşt nine
Di pê min re ketin nine
Û zimanê gunehiyê
Bozmîş dikim*

* -Nuxurî: Qîzî, bukur

SAHÊ BÊ

*Kêlekça ala min, ne biratî û ne rastî
Kêlekça stranên min tîn
Ha ez kom dikim û dare îstînfir dikim
Vehesê li ezmên radixim
Û di bêjeyên xwe de hez dikim, dijîm û dibim
Ha ezî di bin ala sibê de
Perwînan kom dikim
Û ber tîmar dikim
Û ez û baranê di ewr û zengilê wê de xew dikim
Ha ezî stêran bavan(*) dikim û radiwestînim
Û ez xwe dkim
Şahê bê*

(*)- Bavan: Şîra,î

Werger ji Erebî: Mihemed Qer Hesên

Zinarê Şeyda

Zamdarê Zindî

Jî ser rojava ji kar vedigerî, tiştê di dilê wî de pir ne zelal riya wî di bin sênca malê re dibir, ku serê xwe hilde û li hewşê binêre, belkî çavên xwe lêkeve û ew tiştê ku wî dajo, bi dîtina wê re hinekî tebatê dikeve giyanê wî, û ew hêza vîna wê li hev digerîne bi ser avê dikeve û ewê ji ber çavan bi dûr nakeve.

Bi çûn hatina di ber malê re û bi çav lêketinê re, ew hêz li ba wî mîna berxekî di hemêza diya xwe de mezin dibe jêve nas dibû; lê zû zû nikarî aşkere bikira. Rewşa wî ji hêla derûnî ve gelekî ne li ser hev bû, wêneya wê ji sîbergehê dûr ne diket, gava xewkira di xewnê de didît, av vexwera di avê de ditî, gava ro hilhata ewê bi royê hildihat...Weha roj bi giranî û rû tal diborîn. Li vehesa kar ew û dostekî wî ji gund bi hev re nan dixwerin . Heval lê hay dibû, ew nikare nên bixwe û cixarê mîna komira şewitî dikişîne. Jê re

dibêje: Destbira ji demakê vir de tu ne li ser hevî. Ew dudilî dimîne ku tiştê pê hay dibe jê re bibêje lê na ! Piştî ewrekî tarî ji dûmana cixarê li hafa serê wî dimeye û axaftina di hinava wî de, hulmek kûr li cixarê xist keserek bi soj kişand û got: Destbira , ez ji filan kesê, keça filanî hez dikim, ji ber wê serê min tim bi mij û dûman e, ez di hundrê xwe de dişewtim, nizanim çawa bikim.

Heval lê vedigerîne: Ha ho.. ewqas te li pêş xwe dijwar, giran û mezin kiriye, rewşa te pir sane û sivik e. Yê ku ji keçekê hez bike wê xudiyê xwe bişîne jê re bixwazin, tu çû mal ji dê û bavê xwe re bibêjî, bila herin bixwazin, ev çareya herî rast û dirust e.

Ev cara yekê ye raza dilê wî dikelîne, hulma wê der dixîne, hêz tê wî, çêroka dilê xwe ji dê û bavê xwe re hewaldide û doza xwastina filan keça filan kesî dike.

Bav piştî xwe dide dîwarê malê, bi ser xwe de diponije, rî û simêlên xwe

tev dide, şaşka mor ji serê xwe datîne ser çokên xwe, bi rewşa xwe ya civakî, mewdanî û bi daxwaza lawê xwe dirame, dide ser hev dide ber hev, kin dike dirêj dike, digel serpehatên xwe bi dirêjahiya pêncî salî, bi ser de dike û dibêje: Kurê min tu zanî ez gelek ji te hez dikim û tu niha diherî karê xelkê, tu mal mawdanê me weha tune, em heka heka jîna xwe rojane bi xizani derbas dikin; tu çima dixwazî me di vê çala bê binî werki, li rewşa wan binêre, li ya me binêre bi ber hev de, em di tenga hev re ne? Ew li ezmênin em li rûyê zeminê ne, tu çima dixwazî kodika me ya vala li ya wan tijî xîni. Kurê min: Li min bibore, ez nikarim vê keçkê ji te re bixwazim, here yeka di tenga me re bibîne, ezê ji te re bixwazim.

Peyva bavê gelekî dilê wî dikizrand rê û şivêl li ber digirtin. Wî hezkirina xwe jê re hewal dida, êşa xwe jê re şirove dikir û ji berxwadana evîna xwe dikir. Lê bavê derî li dilê wî digirt.

Li serê sibê weke heroj diya wî ji xewê radikir ku here karê xwe, ew bi dengê re radibû, ew xew sivik bû, bi çavçikî û dilşad diçû karê xwe, lê iro dê bangê dike, bangê dike, ji xewa giran şayar nabe, heya çû serî leqand, bi zorê çav ji hev bişkuvîn. Çi bi serê te hatiye? Îro tu ji xewê şiyar nabî. Ew bi lalî dibêje: Ta ber destê sibê xewa min nehatiye.

Weke marekî tevizi xwe ji nav nivîne dikşand, û bi meşek kusefîsî ji mal biderdiket diçû kar, bi rê ve hevalê wî ji paş ve digihêştê. Çi bi serê te de hatiye, leqfîskî û serî di ber de û lingan bi xwe re dixweşîni? Ew çêroka di navbera wî û bavê de bûye jê re hewal dida. Heval dixwaze barê li ser dilê wî sivik bike, ta gihêştin karê xwe weha jê re dipeyvî.

Rewşa wî dijwar dibû, roj pê dibûn sal, av pê tal dibû, deng kirin jê kêmbû, herdem serî di ber de bû, bi ser xwe de gulxwe dina.

Ev rewşa bê çare dirêj dikir. Hevalên wî çêroka wî dibihîst û xwe didan hev

diçûn ba bavê şeyda û jê re digotin: Mamê me, tu zanî kurê te ji keça filan kesî hez dike, Tu çima naherê jê re naxwazî ?

Bav radeya di navbera malbata wî û ya bavê keçê de hewal dide, û pêşde dizane ku eger here bixwaze, wê nedine kurê wî, bersiv li ba wî nase, ji ber wê naxwaze here.

Hevalên kur: Tu here bixwazî bila ne din, gava nedin ne şerm e, tu zirar li te û lawê te nabe, bila lawê te sûc û gunehan neke sukira te, gotinek ji wî yek ji wan, bav nerim dibe û erê dike.

Piştî erêkirina bavê bi xwastinê, dilopek ava vejînê bi ser dil û canê wan de hat û biçekê tîna wan daxist.

Rojekê bavê wî û çend kesên birû diçûn li ser doşka bavê keçê rûdiniştin û doza xwastina keça wî kirin. Bavê keçê li rewş û tenga xwe mêze kir û li ya bavê xort û kesên rûniştine mêze dikir. Ji kesên birû fedikir ku bêje na. Bi hişmedî ji wan re got: Wey win bixêr hatin, li ser seran û li ser çavan

win hatine, Ezê bi keç û mala xwe re bêjim û bersivê ji we re bişînim.

Roj diborin, mihe derbas dibin bersiv netê, hê lawik li benda erêkirinê ye, bersiv dibe xencer di kortika dilê wî wer dibe. Dev ji kar ber dide, rî dirêj dibin û di bezê xwe de diqawire, bejin tê malandin dibe şiv.

Ew gund li sîngê du pesaran e, tenê gelîkî bi çûk wî ji hev dibire û dike du beş, li hember hev in û kanî di nav re diherike. Li hembera mala keçê li hêla din zinarekî mezin heye û av di bin re diherike.

Lawik sibê heya êvarê li ser wî zinarî rûdine, çavan ji mala keçikê nabire, ew diçe du masî çûçik digire, golekê jê re çêdike û tê de tîmar dike, diçe pelê gul û kulîkên rengîn her roj kom dike û masiyan pê tîmar dike. Wî mîna kundekî zêrvaniya keç dikir, li rexê din keçê kînga keys û fiqaq bidîta bi ronahiya neynikê bi xort re dipeyvî, tîrêja ronahiya neynikê herdu dilan tund bi hev girê dida. Ew li dirjahiya germa havînê ji ser zinêr

danedihat, ger cînanan jê bipirsiya: Tu li ber tîna royê li qayla wê naşewtî? Bersiv dida : Ev tîn li ber agirê dilê min qermîtk e.

Ew her roj diçû li ber golekê rûdinişt çêroka evîna xwe ji masiyan re hewal dida, weha masî bû parek ji jiyana wî û ew yek bi xwe nav dikir û yê din jî bi yara xwe nav dikir.

Ew di devê gundiyan de bibû benîşt, çêroka wî ji ser zar û zimanan ne diket, hinan dilên xwe pê dişewtin, hinan terq û tenazî pê dikirin, hinan digot dîn û bodle bûye, hinan jî digot loman ji evêndaran mekin. Wî havînek li ser wî zinarî borandî. Wê dema dirêj û gotinên gundiyan, bi ber pêlên birayên keçê digirtin, li hev kom dibûn û biryar didan li xortê ser zinêr rûniştiye xînin.

Gava keç weha dibihîse, dibeze li rex wan radiweste û bi bav û birayên xwe re dibêje: Ger win li wî filan kesî xînin , ezê namûsa we di axê kim.

Ev gotina bavê ji hundir ve diçelqîne, tamara şîn li eniyê mîna doxekê radibe

û serê wî ditengijîne, zar û mal, gund, ezman tev li dorê digerîn, mîna dîrakekî hişk ji jor ve gêr dibe û remp dikeve xar, li dorê lawên wî dikin hîl wîl, bi lez pîvazekê dişkînin û didin ber poz, ew pîvaz bû firişt ji nuh ve can pê tîne, û dibêje min bihêlin ku ez vehesim.

Lê, keç bi vê bûyerê pir ji xwe tirsî ku bav wê çi bi serî wîn ? Geh kuştin dihat ber dil û geh lêxistin dihat ber dil, gurizî di cên re dibezîn, hin caran li xwe poşmam dibû... Li dawiyê dibêje di kû re der tê bila derkeve!

Bav bi dirêjiya du hevtan bi ser xwe de diramî û gelş ji hemî aliyan ve li pêwrê (dipîva) dixist, kar û zirar dide ber hev. Li ser şekî radiwestî û nûçe bi riya yekî ji wan kesê hatine keç xwastine ji bavê lêwik re dişîne, ku ew bi wî û lêw qayl bûye bila werin bûka xwe bibin.

Bavê lêwik mat mayî dima, zû zû bawer ne dikir ku bersiv rast e, ji xwe di pirsî ev çima erê dike ? ûştta çî ye ? çi bi serê wî hatiye? Sedem û bersiva

erêkirinê di serê xwe de nabîne.

Lê, wê hewaldanê, hemî kaniyên ku di hinava lêwîk de ziya bûne derkirin, gul û kulîk, dar û daristanên giyanên wî ku hişk bibûn tev ji nuh ve şîn bûn, ewr û mijên tarî li ser mêjiyê wî girtin bûn vekşîn, dojecha di dil de vêketî bû vemirî. Ji nuh ve bihuşt di dil de şîn bû. Jiyan pê xweş û şêrîn bû.

Nûça zemewenda Şeyda bi rengêkî dî li ser zar û zimanan belav dibû. Soza zemewendê nîşan dikirin, dost û bira, meriv û xismên wî tevan xwe ji wê rojê re amade dikirin.

Zave qetremîzekî qizêzî tîne û dihere ber golekê, çêroka evîna xwe vê carê bi saz ji masiyên xwe re dibêje, wan dike qêtremîz û tîne mal li ber serê xwe datîne.

Li mala zêve def û dahol ketine hev, tev pê mijûl in, her yek karekî dike, keçik û xortên gund di xemla xwe dixebitin, hin jinên pîr ketine ber keşkê amade dikin, agir di bin qazkên şîvê de gur dikirin. Xelkên beşdar kirin hêlhûl fit kirin

û gotin, bûk û zave hatin, bûk û zave hatin...

Şênî tev li wan mêze û temaşe kirin pîrejinên ku keşk amade dikirin jî bider ketin li bûk û zêve temaşe dikirin, xwe ji bîr vekirin ku agir gur kiribûn. Ji nişka ve şênî dît kulxana reş ji mala zêve hildikişe. Zave bilez dibeze xwe li nav wî agirî dixê û masiyên xwe tîne, li bin dara tûyê ya di hewşa malê de debû, qetremîz di navbera xwe û bûkê de datîne. Hê şênî bi vemirandina êgir mijûl bûn, bûk û zave li reşkên çavên hev mêze dikirin û kela dilê wan radibûn. Ji nişka ve herdu masiyan xwe ji qetremîz davêtin, her yek diket gola dilê yekî, çiqas hewldidan ew jê bider nakevin û di giyanê wan de dipişifin. Zave bi destê bûka xwe digire û dimeşîn, şênî ji paşve bang dikin bang dikin, ew meşa xwe renawestînin û zave dibêje: Win bi pê min kev in. Diçe ser zinarê xwe zinarê şeyda, hildikişe ser zinêr û mîna şahekî bi mîletê re dipeyve: Winê me li ser vî zinarî henekin. Dîlan di dor zinêr re gerî

Hebû nebû keçkike biçuk hebû, bi carikê wê ji çûndina dibistanê hez ne dikir, loma her roj dereng diçû dibistanê, bi rê de dilezand lê dereng digihîşte dibistanê û li şun hevalên xwe dima. Carek ji caran sibehê, wek her car bi lez ji mal biderket, berê xwe dabû dibistanê, dema ku gihîşt koşka kolana gund, li ber koşkê şêrekî mezin Rawestî bû û dikir borebor, çavên keçkê li didanê wî yê wê wek şîşk û kêran ket, keçik di cîh de hişk bû, benz zer bû û nema dizanî çî bike û kuve here. Şêr kir humehum, borebor û got: ezê te bi xum.

Keçka biçûk got: wex li minê û dest bigirî kir. Şêr got: hêdîhêdî netirse? Hîn min gotina xwe bidawî nekiriye, eger tu min bi xwere bibî dibistanê ez te naxum.

Keçkê dîsa got: wex li minê! ez nikanim te bi xwe re bibim, mamosteya min nahêle em ejalekî kedî bi xwe re bibin dibistanê!

Şêr got :ez ne ejalekî kedî me, û dîsa kire borebor, çavên keçkê li dûvê şêr yê ku dileqî û li va alî û li wî alî diket û dikir HumeHum û borebor.

Şêr ji were got: tu dikarî bêjî Mamosteya xwe, Ku ez hevalê te me û bi tere hatime dibistanê, de ka ((em anha herin)). Keçkê dest ji girî berda û got:

xem nîne, lê divê tu soza du tiştan bidî min, ê yekemîn: divê tu Kesekî nexî, Şêr got: lê bê Gûman ez dikarim bikim vîjevîj. Keçkê got: ma tu nikarî bêyî wê bimîne?

Şêrgot: na ez nikarim.

Keçkê ji Şêr re got: xem nîne, bike vîjevîj. Ya didiwan, tu yê min bihêlî ku li piştta te Siwar bim.

Şêr got: pir baş e. ez gelekî kêfxaş im, Şêr liber kevirekî rawestî, keçik li piştta Şêr siwar bû, bi pirça gepira wî girt û bi hev re bi lez berê xwe dan dibistanê û çû, lê dîsa dereng gihîştin dibistanê.

Şêr û keçkê derbas oda dersdanê

bûn. Mamosteyê navên şagirtan dixwandin, ka kî hatiye û kî ne hatiye. Dema çavên mamosteyê li şêr û keçka biçûk ketin, çavên wê beq bûn, di cîh de zer bû û dest ji xwandina navan berda, zarok jî tev şêr û mêt di cihên xwe de man û neman deng ji wan derhat.

Mamostayê ji kêçkê re got: ma tu nizanî em nahêlin ejalên kedî têkevin dibistanê, kêçkê bi lez got: ev ne Ejalekî kedî ye ev hevalê min e, xwast bi min re bê dibistanê, da ew jî ho bibe xwandinê, Şêr jî di ber gotinên keçkê re dûvê xwe virdewirde dileqand.

Mamoste jî hîn çavên xwe ji Şêr ne birîbûn, ji keçkê re got: Baş e, baş e, ka nave hevalê te çî ye?

Keçkê got: navê wî Niwêl e, Niwêl û bes, wî navê Şêr ji zimanê Firansî bervaja got û bû Niwêl.

Mamoste navê wî jî li ba xwe nivîsand, xwendina navan berdewam kir û gihaste navê dawiyê. Mamoste navê keçikê xwend got: ((Pitî simol)), keçikê got: Belê ez va me. Mamoste got: Niwêl, Şêr lê vegerand: Ez im, û di ber re kir humehum. Berî ku devê xwe heya dawiyê veke, û ta ku mamoste diranên wî yên wek şîşik û kêran nebîne, Şêr dûvê xwe jî neleqand û ne kir borebor jî, Şêr li kêleka keçikê bêdeng rûnişt.

Şêr ta dawiya li rex keçikê bêdeng mabû, kesekî ji şagirtan ne diranên wî dîtî, ne jî nênpkên wê dîtî, dengê wî jî nedihat der. Eger mamoste jê nepirsiya

deng jê ne dihat der, ne dikir qir û ne cir.

Di dema lîstinê de, keçikê Şêr ho kir çawa şîr bi şenîmonê vexwe.

Keçikê got: ev Şîr e, vexwe. Ewê diran û hestiyên te xort bike.

Şêr got: Baş e, ez jî dixwazim diranên min xort bibin, ta kanibim bi wan keviran jî bihêrim. Şêr piyala şîr bi firekê re vexwar.

Keçikê keçik û Şêr bi hev re çûn yarîgehê, dema çavên zarokan li şêr ketin, her kes di cihê xwe de rawestî, çav beq kirin û bi tirs li Şêr temaşe kirin. Piştî kêlîkekê dest bi lîstikên xwe kirin, virde wirde diçûn û dihatin û dibezîn. Keçik û Şêr ve li aliyekî yarîgehê rûniştîbûn li zarokan temaş dikirin.

Şêr ji keçikê pirs kir: çima em jî wek wan nalîzin?

Keçikê got: ez ji lîstika bi wan re hez nakim. Çimkî hinek ters di nav wan de hene, ez naxwazim bi wan re bilîzim. Ji ber ew lingan didin ber mere û mera gêr dikin.

Şêr kire borebor û got: ew nikanin min gêrkin û bêxin.

Keçikê got: yek ji wan mezine, mezintirîn hevalên xwe ye li dibistanê. Navê wî Cak Yol e, ew tim lingên xwe dide ber min û min gêr dike.

Şêr got: kîjan ew e, tu ji min re destnîşan bikî.

Keçikê destê xwe berve wî dirêj kir û got: ha ha..ewî han ew e.

Şêr got: aa... ew cak tol e!?

Di wê demê de zengil lêket, zarok berve polên xwe bezîn û vegeirîn xwendina xwe berdewan kirin. Şêr û keçikê jî bi hev re vegeirîn, di cihên xwe de rûniştin. Mamoste jî bi dengê bilind dest bi xwendina çêrokekê kir.

Paçê arokan wêne çûkirin ta dema xwarina nêvro, Şêr jî wêneyek xwe çêkir.

Şêr ji keçikê pirs kir: xwarina îro çi ye? Ez bi hêvîme ku xawrin goşt be.

Keçikê got: na , xwarin ne goşt e, xwarin masiyên biçûk in, çimkî îro roja Înê e.Keçikê Şêr ho kir çawa bi pêûsê bigre û masiyên biçûk çêke. Şêr li bin wêneya masiyên ku çê kiri nivîsand: ez ji masiyan pirtir ji goşt hez dikim.

Ew li dema xawrinê li ber masê di

cihê xwe de rûniştibû. Xawrina wan ji masî, bazile û kartolên kelandî û kutayê pêk dihat.

Şêr xwarina xwe bilez xwar û xwarina ji ber keçikê mabû jî xwar û got: ez hîn birçî me, ez dixwazim xwarina min goşt be.

Piştî xwarinê, zarok tev bezîn yarîgehê û dest bi lîskên xwe kirin. Yên mezin virde wirde dibezin û lîska xwe dikirin. Ewê mezintir ji wan (Cak Tol), ew jî fere fere dibezî şû berve keçikê dihat.

Şêr jê re got: ji vir bidûr keve, dûrî hevala min here. Tuyê wê gêrkî erdê.

Cak Tol got: ez bidûr nakevim û xwe di Şêr de qij kir û gaf û gur danê. Keçikê xwe dabû paş Şêr. Êr jî dûvê xwe virde wirde dileqand. Cak Tol jî her diçû

berve Şêr û keçikê dihat û nêzîkî wan dibû.

Şêr carekê kire bore bor û hume hum, wê gavê çavên Cak Tol li diranên Şêr yên mîna şîşan û kêran ketin, di cih de hişk bû û nema ji cihê xwe livî, çav beq bûn, li Şêr û diranên wî dinihêrî. Şêr jî hîn devê xwe vekir, heya dawiyê vekir. Cak Tol ra gewriya wî dît, devê Şêr mezin, fereh û kûr mîna tûnêlekê bû. Tirs kete dilê Cak Tol, rengê wî hat guhertin û zer wek lêmûnê bû.

Şêr lipêhev kire bore bor, hemî mamosteyên dibistanê ji odayên xwe biderketin û berve yarîgehê bezîn, daku bibînin çi heye.

Zarokan jî dest ji lîskên xwe berdan, tiliyên xwe dan ser guhên xwe daku dengê Şêr nebihêsin. Cak Tol di cih bi şûnde vegeerî, beziya, beziya.. ji yarîgehê biderket derve û di kolanan re beziya ta gihîşt mal ba diya xwe, hilekişa wî bû, reng zer bibû, tu dibêjî qey xwîn tê de nema bû.

Keçik ji paş Şêr biderket û jê re got: sipas ji te re, te xweş kir, ji virûşûnda ez nema ji wî ditisim û pê diramim.

Şêr got: ez pir birçî bûme, min kanî ew bi gepekê re bixwara, lê min soz dabû te ku ez kesî naxum.

Keçikê got: wilo rast e, çimkî diya wî dê xemgîn biba. De rabe, dema xwandina piçtî nîvro bû. Kanî em herin xwendina xwe berdewan bikin.

Şêr got: ez piştî nîvro li dibistanê namînim, divê ez herim li xwarineke xwe bigerim. Keşikê got: de baş e, ezê te roja duşemê bibînim. Keşik çû xwendina xwe berdewam bike, Şêr jî bêdeng derket, ji dibistanê bidûr ket û li nêçereke xwe gerî.

Keçikê roja duşemê sibê zû xwe amade kir, bi eşq ji mal derket û berê xwe da dibistana xwe daku hevalê xwe Şêr bibîne. Lê mixabin Şêr wê rojê nehat dibistanê û keçikê ew nedît. Mamosteyê navên minalan yeke yek xwend, dema gihîşte navê keçika biçûkk got: Pitî Simol, keçikê got: ez va me. Mamoste got: Niwêl, kesekî lê venegerand.

Piştî demekê, mezintirîn minal berve keçikê hat û jê pirsî: kanî ew hevalê deng bilind?

Keçikê lê vegeand: ew îro nehatiye.

Zarok got: Ma ewê rojeke din bê?

Keçik: bêguman ewê bê, lê divê tu haje xwe bikî ha... çimkî henek bi wî re nabin. Bi vî awî keçik ji zarokê mezin hat parastin.

Pêncîsaliya Avakirina
Partiya Demokrat a Kurdistanê
li Sûriyê

Zîna Şikakî- Parîs, 16.06.2007

Li 16 meha Hizêranê, li Enstûtiya Kurd a Parîsê, pêncîsaliya damezrandina yekemîn partî, Partiya Demokrat a Kurdistanê li Sûriyê hate kirin. Nûnerê Enstûtiya Kurd a Parîsê pêşperî û xêrhatina mêvanan kir.

Pê re, li ber dengê Şivanperwer û Ey Reqîba Dildar, demek şipê bona rêzgirtina Nemirên Kurd û Kurdistanê hat rawestan.

Name û daxuyaniyên Partiyên hatin xwendin jî; ev bûn:

- Beyana Komîta Hevbeş a Hevbendî û Bera Kurd li Sûriyê.
- Nama serokê Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, Isma'îl 'Umer.
- Daxuyaniya Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê.
- Axaftina nûnerê Partiya Demokrat Kurdistanê (Rohilat), Xusro Ebdelahî.

Berêzên ku beşdarî Pêncîsaliya avakirina Partî bibûn, hevalên xwe yê avaker û çend endamên pêşeng ên Partî ji vê sêminarê re agehdar kirin; gotin û pêşniyar û nêrînên wan girtin; yek ji beşdaran DR.Xelîl Mihemed bû.

Di sêminarê de, berêz Dr.Xelîl Mihemed gotinek li derbarê damezrandina Partî û bîranînên xwe xewnd, ji ber şêrîniya zimanê wê û giringiya naveroka wê, me baş dît ku xwendevanên Pirsê wê bixwînin.

Gotina Dr. Xelîl Mihemed

Xûşk û birayên Xoşewîst...

Hevalên hêja û berêz ...

Silaveke niştimanî, germ, li we hemîyan dikim û hêvîdar im ku sêminara we bi awakî çalak û rêk pêk bi serî bibe û serkeve.

Gelî hevalên berêz...

Be bûneyî bîranîn û salyada 50î ya damezrandina Partî Demokratî Kurdistan (PD Kurd) li Kurdistana Rojava, silaveke taybet li wan hevalan

dikim, ku Îro, li vir, li va sêmînarê em gihandine hev û kom kirine.

Ez gelek sipasî hevala dikim ku dawa li min jî kirin, ku beşdar bim, li va sêmînarê, wek yek ji hevalên PDK li Sûryê damezrandine.

Bê gûman, damezrandina PDK li Kurdistana Rojava berî 50 salî kete dîroka gelê me, ji ber ku yekemîn car bû ku li vî perçeyî rêkxiraweke wilo hate meydanê.

Hevalên berêz...

Ji min wek hevaleyê beşdar di damezrandina PDK de tê xwastin, ku ez ji we re bipeyvim: çawa me PDK li Sûryê damezrand?

Damezrandina partî ne li ser valahiyê bû; partî li ser bingeha serpêhatî û bûyerên ku li Kurdistanê rû da bûn hate meydanê, wek serhildan û şoreşên Kurd li Kurdistana Bakur, Başûr û Rojhilat.

Piştî ku agirê şerê cîhanê yê Diwemîn vemirî, çend bûyerên girîng li ba Kurdan rû dan, wek: damezrandina Komara Mihabadê û damezranda PDK li Başûrê Kurdistanê û gelek rêkxraw û komeleyên Kurdî

yên dinê.

Lê, dengê va serpêhatî û bûyeran bi şêweyekî fere negihaştin gelê Kurd li Sûryê, ji ber ku çapemenî kêmbû û rewşa gelê me ji hemî aliyan da li paş bû. Ji aliyê aborî de, wek em zanin, aboriya herêma Kurdistanê li ser kiştûkal (çandinî) bû, û dewar û pez xwedî dikirin; ev jî gelek li paş bû. Civaka Kurdî ji bingehê xwe ve cotarî, axa, derebegî û şêx û mela bû.

Ji aliyê rewşenbîrî de, em dikarin bêjin, ku ta sala 1945 li çiyayê Kurmênc tenê yek dibistan hebû; li şarê Efrînê bû. Di vê salê de, em xwandekarên kurd di qola (sinfê) 5ê de tenê 25 xwandekar bûn. Ta sala 1945, tenê 3-4 xwandekar li çiyayê Kurmênc sertefika (şehada) Bekalorîya standi bûn. Di salên 1946–1950 de, em, xwandekarên Kurd, li Dibistana Techîzê (sanewî, lîsê) li şarê Helebê pir hindik bûn, li ser tilîyan dihatin jimartin. Ji ber van sedeman, şiyarbûna netewî li herêma Kurdistanê pir zêf bû.

Di van salan de, em 6–7 xwendekarên Kurd ku me li

Helebê dixwend, her maweyekê wek Komeleyeke Kurdî li hev dicivîn û kom dibûn; li ser Kurdayetiyê, li ser rewşa Kurdên me li Sûryê û li ser perçeyên Kurdistanê yên dî em dipeyvîn. Her wiha, ta sala 1950 hinek komele û rêxirawên Kurdî li çiyayê Kurmênc û herêma Cizîrê hatin meydanê.

Hevalên dilsoz...

Bi vî awayî Kurdayetî, xebata kurdî li Sûryê, kete qonaxeke nû; dîdarî û kombûna hevala zêdetir bû.

Em û Piştgirên Aştîyê û Partiya Komonîst li Sûriyê:

Ji ber ku em hemî genc bûn, xwendekarên dibistanan bûn, xebata me di hemî warî de zêf û kêmbû: siyasî, rêxirawî û rewşenbîrî. Lewre, me xwest û hewil da ku bi rêxiraw û saziyên bi xibret û tecrîbe re bidin û bistînin û kar bikin. Me li çiyayê Kurmênc alîkarî bi tevgera Piştgirên Aştîyê re kir; vê tevgerê di bin siya Partiya Komonîst de kar dikir. Bi vî awayî, hêdî hêdî, wek komeke Kurdî em ketin Partiya Komonîst; bernama wan jî bawerî bi mafê netewî yê gelan

dihanî. Gelek neçû, endamê Mekteba Siyasî û Encûmena Nawendî ya Partiya Komonîst, Ehmed MIHEFÊL, li Helebê, ji me hevalên Kurd pirsî:

- Win çawa çapemenî û belavokên Partî (Komonîst) bi Kurdan didin nasîn û zanîn?

Me got: em bi Erebî dixwînin û ji wan re bi Kurdî hewal didin. E.MIHEFÊL ji me pirsî: ji bo çi win ji wan re bi Kurdî çapemenî û weşana nakin?

Me got: ji ber ku li ba me dektîlo û aleta çapemeniyê tune.

Hîngê, ji me re got: baş e, emê ji we re piştî çend rojan dektîlo bînin, ta ku win kari bin belavoka çap bikin û bi Kurdî belav kin. Em gelek şa bûn. Me di nav xwe de got: bi rastî, Partiya Komonîst mafê netewî yê gelan diparêze û baweriya xwe pê tîne.

Roj derbas bûn, lê bedaxewe, dektîlo ji me re nehat. Dema ku me ji wan pirsî: ka çawa bû? dektîlo nehat? MIHEFÊL ji me re got: hevalno, rewşa siyasî nahêle ku em belavoka û çapemenî bi Kurdî derxin û belav bikin. Bersiva wî aveke

sar bi ser me da kir, û xûya bû ku mesele ne weke ku me bawer dikir bû.

Roj bi roj, helwesta Komoîsta rontir bû. Em pê hesiyar û me hest kir ku Partiya Komonîst dixwaze kadirên Kurd ji herêmê bi derxîne û wan li herêmên din li Sûryê belav bike. Va daxwaza Partiya Komonîst bi kêrî me nehat. Weha, xîlaf û nakokî ketin navbera me, û me rexne li hevdi kirin. Li hîlbijartina Parlemanî, di sala 1954 de, namzetê Partiya Komonîst li çiyayê Kurmênc hevalê me, Reşîd HEMO bû, belam bi ser neket. Roj bi roj, em, hevalên Kurd û Partiya Komonîst ji hev bi dûr ketin, û li taliyê, piranîya me, bi hev ra, em ji Partiya Komonîst derketin.

Piştî van bûyeran ku em hinekî şiyar kirin, û xibret û tecrîba me di warên partayetiye û di rêk û pêkbûnê de zêdetir bû, me bi pêwîstî dît ku partiyeka netewî û demokrat damezrînin.

Di vê qonaxa Kurdayetiye de, tevgera Kurdî li herêma Cizîrê jî gavin nû davêtin. Pêwendî di navbera me û hevalên Cizîrê de çê bûn; çûndin û hatin di navbera me de zêde bûn. Di wê demê de, li Cizîrê Partiyek hati bû damezrandin, bi navê AZADÎ -

ger ez ne şaş bim – hate nas kirin. Em, hevalên çiyayê Kurmênc û Cizîrê gihastin baweriyekê ku rewşa gelê Kurd kete qonaxeke nû û pêwîst e em partiyekê li Kurdistanê Sûryê damezrînin.

Ez yekê dibêjim û yekê nabêjim, di van salan de pir dîdarî û kombûn di navbera me, rêkxirawên Kurd li Sûryê û hin hevalên ji Kurdistanê Îraqê, wek heval Celal Talbanî û Izziddîn Mela Mistefa Resûl, û ji Kurdistanê Îranê, wek Rehmetî Ehmed Tewfîq, Hejar û Îssa Zebêhî, rû dan. Ev heval li Sûryê bûn, ji ber ku rewşa siyasî li Îraq û Îranê gelek xirab bû. Piştî dandin û standina, hatin û çûndinan, me hevalên çiyayê Kurmênc û Cizîrê biryar da ku partiyekê damezrînin. Me biryara xwe di meha hezêranê, sala 1957, bi cî anî. Di kombûna damezrandinê de ev heval hebûn:

- Ji Cezîrê: Hemîdê Hac Derwêş, Hemze Newêran

- Ji çiyayê Kurmênc: Reşîd Hemo, Şewket Ne'san, Mihemed 'Elî Xoce, Xelîl Mihemed.

- Ji Şamê: Osman Sebrî

Nayê bîra min ku hevaline din jî hebûn yan na. Wek min bihîstî, di pirtûka hevalê me, Hemîdê Hec Derwêş de, ev meselene bi ronahî hatine xûya kirin.

Di kombûna damezrandinê de, bernama partî û nîzama bingehîn –hindirî– hate danîn, û her weha navê partî bû: P.D.Kurdistan. Bi vî awayî, partî hate damezrandin. Di Kombûna pêşin de, mijarên sîyasî, rêkxirawî, rewşenbîrî û xebatkarî ron bûn, cîyê xwe girtin û daxûyanîyek hate danîn.

Piştî ku bername û destûra hindirîn hate danîn, hevala biryar da ku pêwîst e bernama Partî bidin Qinsilê Giştî yê Yekîtiya Sovyetistanê li Helebê. Ev karê hanê dan ser milê min. Ez çûm Qunsulxanê; Qunsul ez pêşwazî kirim û pê re ez rûniştim. Min bername û daxûyaniya Partî pêşkêşî wî kir. Qunsul soz da û got: ezê bighênim berpirsyarên Sovîyêtî.

Yek ji biryarên kombûnê ew bû, ku çapemeniya partî xurt bikin û warê rewşenbîrî pêş de bidin. Ji bo vê yekê, pêwîst bû ku dektîlo û aleta kopiya – cestitnêr – pêk bînin. Min ji hevala re pêşnîyar kir, ku vê meselê bispêrin min, ji ber ku hinek zanîn û xibret di vî warî de li ba min hebû. Hevala pêşnîyara min qebûl kir. Ji bo cîbecîkirina vê biryarê, ez çûm Şamê, min alet kirin û anîn Helebê. Pir neçû, yekemîn belavok me bi Kurdî, bi tîpên latînî çap kir û derxist. Vê bûyerê gelek şahî û ûmidi xiste dilê me

hemiyar.

Wiha, partiya me hate meydane û hêdî, hêdî endamên Encûmena Nawendî zêde bûn û gelek heval wek mamoste Gigerxwîn, şêx Mihemed Îssa, Dr. Nûriddîn Zaza ketinê. Bem şêweyî, partî rêzên xwe tikûz kirin û kar û bar bi rêk û pêk kirin, û li hemû herêma Kurdistanê Sûryê belav bû.

Hevalên berêz...

Va ye, bi kurtî, û weke tê bîra min, min ji we re damezrandina P.D.K. li Sûryê ron kir.

Pêncî sal derbaz bû. Va ye, em dibînin, çawa rewş hate guhartin.

Berî 50 salî, yek partî bû, lê niha zêdeyî 4–5 an e. Eger wê demê xwendekarên kurd li ser tiliyan dihatin jimartin, niha jimara wan bi deh hezaran e, bi hezaran dîplomên bilind di hemî warên zanistîyê de standine; eger hepsiyên me wa demê çendik bûn, niha, bi sedan e.

Kerwan diçe, û wê bi lez here û zêde bibe ta bighêne armanca xwe.

Em hemî dendarê gel û welatê xwe ne...Da bijî Kurd û Kurdistan Zor sipas

((DR. XELÎL MIHEMED : Li Sala 1933 an li gundê Keferdela Jorin, çiyayê Kurmênc, ji dayîk bûye; destpêkê, xwendina mamostatîyê (Dar el mû'elîmîn) li Sûryê kiriye; di pê re, Hiqûq (dad) li Îraqê xwendîye (wî û Mam Celal, bi hev re ezmûn derbas kirin). Komîta Navenda PDK- Başûr li ser wesêka Mela Mistefa Barzanî ew şandin Sovyêtistanê; li Taşqendê, Dibistana Kadirê Hizbî ya Bilind kuta kir. Diktora di Aborê de istand; yek ji avekerê pêşin ê Partiyê ye; ji sala 2005-an de li Sûryê, li bajarê Helebê dijî.))

Aloziya kesê siyemê kom

bi lêkerê têper re

di buhêrkê de

Rozad Elî

Dibin vê navîşanê de, li meha yekê 2007 an, berêz **Hozan Robar** lêkolînek di malpera Rojava.net de weşand. Me jî xwest nêrîna xwe li ser wê aloziyê bidin. Emê ji destpêkê de werinê....

Wekî ku em dizanin, mêjera navdêran di Kurmancî de bi serê xwe ne diyar e. Wek:

Sêv, Mirov, Dar, Pirtûk, Malper, Kovar, Gotar... Hemî navdêr in, lê ne nas e ka ew di rewşa yekejimariyê yan di ya gelejimariyê de ne.

Mêjera navdêran di riya pênc rewşên veguhastina bêjeyan re diyar dibe. Ew jî ev in: «Tewang, veqetandek, jimarnav, pirtikên nependî û lêker».

Di hevokên navane de, naskirina mêjera navdêran nabe pirsgirêk, çinkî ew yekser bi riya veqetandek, jimarnav, pirtikên nependî diyar dibe.

Nimûne:

1. veqetandek:

- yekejmar: keçeke xwende
- gelejmar: keçikên xwende

2. jimarnav:

- yekejmar: sêvek (yek sêv)
- geljmar: heft sêv

3. pirtikên nependî:

- yekejmar: sêveke sor
- gelejmar: sêvina sor

Lê aloz di *dema borî ya hevokên lêkera têper* de ye.

Wekî em zanîn, rêziman dide ku di wan hevokan de navdêra kirar were tewandin û jimara xwe diyar dike, lê ew rê nade ku navdêra (biresera durust) jî were tewandin û jimara xwe diyar bike. Û gava ku jimara bireserê bi alîkariya veqetandek, jimarnav an pirtikên nependiyê jî diyar nebibe, birser neçar dibe jimara xwe bi alîkariya lêkerê bide nasin.

Em wînin bîra xwe,

tewandina navdêrê di hevoka lêkerî de di van rewşan de çê dibe:

1. Gava navdêr kirarê lêkerê têper be, di dema borî de.

- **Şêrînê helbest xwendin.**

Di vê hevokê de, mêjera kirarê bi riya tewngê diyar dibe, û li şûna wî cinavên tewandî jî bikar tên:

- **Wê (Şêrînê) helbest xwendin.**

Lê ji ber ku di vê rewşa veguhastinê de tewandina bireser (helbest) ne gengaz e, mêjera wê di riya Lêkerê re diyar dibe:

- **Şêrînê/wê helbest xwend (bireser yekejimar).**

- **Şêrînê/wê helbest xwendin (bireser gelejimar).**

2. Gava navdêr bireserê durust yê lêkerê têper be, di demên wêbê, niho û raweya fermanî de .

Niho: **Memo keçekê, Ferhêd û hevalina dibîne.**

Wêbê: **Win dê keçekê, Ferhêd û hevalina bibînin.**

Fermanî: **Memo! Keçekê, Ferhêd û hevalina bibîne!**

Di van hevokan de, navdêra

bireser tê tewandin û mêjera xwe di riya tewanga xwe re diyar dike. Lê belê kirar netê tewandin, ji lewre vê carê kirarê di riya lêker re diyar dibe:

- **Memo/ew wan dibîne (kirar yekejimar) .**

- **Win wan bibînin (kirar gelejimar).**

Em kanin bêjin:

((Bi gelemperî, lêker ji aliyê mêjerê ve yan bi kirarê yan bi bireserê ve têkildar e. Çawa?: Tewang kane mêjera navdêrê (kirar, bireser) xuyan bike, lê hema navdêra ku netê tewandin, ew bi alîkariya nîşandekên jimarîne yên ku bi dawîya lêkerê dikivin, xuyan dibe)).

1. Gava kirar were tewandin:

- **Mirovan dar çand:**

(mirovan) kirar e, hatiyê tewandin û jimara xwe diyar bûye. Lê «Dar» nehatiye veguhestin, loma jî jimara wê nehatiye naskirin. Da ku em zanibin mirovan darek lê bêtir çandine, lêker tê veguhastin, nîşandeka jimarîne distîne û jimara «dar» xuyan dike ku ew darek e ne zêde.

- **Mirovî dar çandin:**

Di vê hevokê de jî, bi alîkariya tewangê xuyan dibe ku mirov (kirar) yekejimar e, lê gelejimarîna (dar, bireser) bi riya lêker diyar bûye.

2. Gava bireser were tewandin:

- **Mirovî daran diçînin:**

- **Mirovî daran diçîne:**

Di van herdû hevokan de, kirar nehatiye veguhestin û jimara wê ne diyar e, ew bi alîkariya lêkerê tl nasîn. Lê jimara darê bi riya tewangê xuyan bûye ku ew gelejimar e.

3. Eger mêjer navdêr (kirarê yan biresera durust) di riya veqetandek, jimarnav û pirtikên nependî re diyar bibe jî, dîsa lêker nîşandeka wê mêjerê distîne.

a. Kirar tewandî be:

- **Welatî/welatiyan darên merxê çandin.**

Digel ku jimara daran bi alîkariya veqetandekê diyar bûye, lê dîsa lêker di rewşa gelejimariyê de tê.

b. Bireser tewandî be:

- **Welatiyê me daran diçîne**

- **Çar weliyên me daran diçînin**

li vir jî, digel ku jimara navdêra kirar tam diyar e, dîsa jî lêker di rewşa gelejimariyê de hatiye.

Em werin ser nimûneyên rêzdar Hozan Robar.

Ew dibîne (aloziya kesê seyemê kom bi lêkerê têper re di buhêrekê de) heye. Yanê alozî di vekîtê de ye. Ew pêga xwe dide ser guhdarî û bihîstina hin kesan, û radibe li ser wê rêzaneke rêzimanî pêşniyar dike⁽¹⁾.

Kanî em nimûneyên ku wî ji pirtûka mamoste Samî Tan anîne, û têbînên xwe li ser dane bêjin.

Ew dibîne vekîta van hevokan wilo rast e:

- **Apê min û bavê min dersdariya medresên dînî dikirin.**

- **Berpirsyarên Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê daxwaz ji min kirin ku ez**

- **Beşdarî semînereke li ser Ehmedê Xanî bim...**

Di baweriya me de (wek Samî Tan jî dibêje), şeweya rast ji wan re ev in:

- **Apê min û bavê min dersdariya medresên dînî dikir.**

- **Berpirsyarên Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê daxwaz ji min kir ku ez**
- **Beşdarî semînereke li ser Ehmedê Xanî bim...**

Çima ev şêwe rast e?

Eger em hovakan kurt bikin ewê hêsantir bibin û werin têgihîştin:

- **Ap û bavê min dersdarî dikir.**

Di vê hevokê de, jimara kirarê (ap û bav)nas e, gelejimar e, yanê didu ne û cinava kesîn jî di rewşa tewandî de pê re hatiye. Lê belê jimara bireser (dersdarî) nehatiye naskirin, li vi mecal nîne ji bilî ku jimara bireserê di riya lêker re diyar bibe. Yan hevok bi rengê ku Samî Tan dibêje were nivîsîn.

- **Berpirsyaran daxwaz kir.**

Di vê hevokê de jî, jimara kirarê (berpirsiyaran) nas e, gelejimar e, ew bi riya tewandinê hatiye naskirin. Lê jimara bireser (daxwaz) nehatiye, ji lewre jî mecal nîne ji bilî ku jimara bireserê di riya

lêker re diyar bibe. Yanê hevok bi rengê ku Samî Tan dibêje were nivîsîn.

Û herwiha ev mînakên din yên ku mamoste H. Robar:

- **Beşdarên konferansê bal kişand ser...**

(**bal**, bireser e, nehatiye veguhastin, jimara wê ne diyar e, wê lomê jî ew di riya lêker re diyar dibe ku yekejmar e, yanê **balek** e, ne gelek in).

- **Beşdarên konferansê diyar kir ku ...**

(**diyar**, bireser e, nehatiye veguhastin, jimara wê ne xuyaye, wê lomê jî ew di riya lêker re xuyan dibe ku yekejmar e, yanê **diyarkirinek** tenê ye, ne gelek in).

- **Beşdarên konferansê bang li dewletên ku kurd hemwelatîyên wan in kir ku...**

(**bang**, bireser e, nehatiye veguhastin, jimara wê ne xuyaye, wê lomê jî ew di riya lêker re xuyan dibe ku yekejmar e, yanê **bangek** e, ne gelek in).

¹ - **Rêpîvan**: lêkerê têper di dema buhêrkê de li gor bireser tê veguhastin.

- **Awarte**: Eger kirarê lêkerê têper, kesê siyemê kom be û ew navdêr be û bireser ne yekser li paş kirar be, hingê lêkerê têper li gor kirar tê veguhastin.

JI BINGEHÊN RÊZIMANA KURDÎ

(Pirtûka Hînkirinê)

Wekî ku gulistan bê gulên geş namînin, û daristan bê darên bilind namînin, tucarî gel jî bê zanyar û ramyar namînin. eger xwendevan û nivîskarên kurd çavên xwe di pirtûxana ziman û rêzimana kurdî de bigerînin, ewê bi dehan jêderên rêzimana kurdî bibînin, wek (Celadet Bedirxan, Qinatê Kurd, Samî Tan, Alan Osman, Haydar Diljen) h.w.d.

Di sala 2006 an de, jêderk nû ji jêderên rêzimana kurdî pirtûkxana zimanê kurdî Zengîn û xanedan kir, ew ji amedekirina Dr. Mihemed Ebdo Elî ye, pirtûk bin nave (JI BINGEHÊN RÊZIMANA KURDÎ - Pirtûka hînkirinê) hatiye çapkirin.

Pelên wê ji pîvana orte ne / 25 – 14 /c.m. Ew ji / 164 / rûpelan pêk hatiye.

Di naveroka pirtûkê de, ev mijarin jêrîn hatine danîn.

- | | |
|------------------------------|---|
| - Pêşgotin 2 rupel . | - Hêmanên lêkerê 9 rupel. |
| - Elfabiya kurdî... 7 rupel. | - Kesandina lêkerê.... 11 rupel. |
| - Kît û Bêje... 9 rupel. | - Kesandina lêkerê tofa 2.. 10 rupel. |
| - Navdêr ... 8 rupel. | - Kesandina lêkerê (Bûn).. 9 rupel. |
| - Veqetandek ... 6 rupel. | - Kesandina lêkerên teneper .. 9 rupel. |
| - Tewandin 6 rupel. | - Herîn û Werîn, Hatin, Kirin.. 14 rupel. |
| - Jimarnav 8 rupel. | - Ferhengok... 16 rupel. |
| - Cinav 17 rupel. | - Rengdêr .. 8 rupel. |
| - Hoker 7 rupel. | -Lêker ... 6 rupel. |

Dr.Mihemed Ebdo Elî , di pêşgotina pirtûkê de dibêje:Li sala 2000an, min û herdu hevalên xwe Dr. Kamîran Bêkes û Mamoste Can, pirtûkek rêzimên bi navê(Rêzimana Kurdî) amede kir, mebesta me jê ew bû ku bibe pirtûkeke rêzimana kurdî, lê gava ew pirtûk dakete warê kar, me dît ku bi xwendevanan giran e, û li ser daxweza zimanhezan, min ev pirtûk amede kir, hêviya min ew e ku bi kêrî hînkirina zimên bê.

Ev pirtûka rêziman ya Dr. M. E. Elî ji aliyê gelek girûpên fêrkirina zimanê kurdî ve di nav kurdên Sûryayê de tê bi karanîn.

Bi rastî, ji ber zengîniya vê pirtûkê ji aliyê rêzimana kurdî ve, divê ew di pirtûkxana her zimanhezêkî de bê dîtî, ji ber ew jêdereke ji jêderên rêzimana kurdî ye, mijarên wê pir zelal û hisan hatine danîn.

Belê gurzek sipasî ji bo pênuşê zimanhez mamostayê zimanê kurdî D.M.Ebdo Elî, û ji her Kurdekî ku xwe di riya parastina zimanê zikmakî de diwestîne.

Merwan Berekat

Nameya kovarên Kurdî

Di vê dema dawî de, di malper û belgeyên Enternetî de, me destekên rêvebir; nivîser û xwênerên kovarên Kurdî, yên bi tîpên Latînî li Sûriyê têne weşandin, peland, ku êrîşeke bêtam û bêbingeh, ji hêla Dr. Ferhadê Şakilî ve hatiye ser Bedirxaniyan, nemaze li ser Mîr Celadet Bedirxan. Ew Mîrê ku jiyana xwe, hiş û ramanên xwe, bîr û boçûnên xwe di ber pîrsa Kurdî de, di ber çand û toreya Kurdî de, di ber ziman û rêzimanê Kurdî de terxandine. Bi ser ku em, weku kovarên Kurdî, xwe Şaxek ji dara " HAWAR " ê dibînin û jîndariya vê kovarê berdewam dikin. Wilo jî nivîser, xwêner û rewşenbîrên me, bi tevayî, di warê netewnasî, zimanzanîn û bîrgeşiyê de, xwe suxteyên Bedirxaniyan dinasin. Ji ber ku Malbata Bedirxaniyan sembnola wêje û zimanê Kurdî ye. Lê, em napelînin, ku Bedirxanî li hêviya bergîrî û bervedêriya me ne. Na, bi kêmanî, li ba me, ev mijar çareser kirî ye û ne gerekî guftûgoyê ye. Ne tenha wilo, lê dîroka kar û xebata wan, sranserî Kurdistanê, wan diparêze û wan rûmetdar dinase. Bi ser vê tevî de jî, em behweriyên li ser bingehên zanistî û rasteqînî dipejirînin û xwe, di gemkirina xwedan behweriyên resen û petî de, mafdar nabînin. Wilo jî, em hewil nadin ku perda evrayî bi ser kesekî de berdin. Lêbelê, dema mebest, ji hewildanên bi vî rengî, hêrivandina bingehên dîroka çand û toreya Kurdî bin, destavêtina hebûna navnas û navdarên pîrsa Kurdî bin, em bi tundî hemberî van karên arzan û bînîrx radiwestin û wan şermezar dikin. Ne tenha wilo, lê em pûçkirina dîtinên bi vî rengî erkên xwe dibînin. Eger mebesta Dr. Ferhadê Şakilî ji van behweriyên çewt û arzan, tevrakirina hêrizên zarperestî bin, hêviyên gurkirina nakokiyên herêmane bin, yan jî berxwedanên zaravperestî bin, ji xwe Kurd ji vê qonaxê derketine û nema lê vedigerin. Ango, bîr û boçûnên wî, eşkere, ziyandar in, kesek bi wan napîve û dem di ser wan re derbas bûye. Ew jî, bi vî awayî, pûşekî vala dikute. Dimîne em bêjin, ku berçavkirina asteng û problemên ziman û zaravên Kurdî, wilo jî rengên Alfabeyên Kurdî, bi van dîtinên xav û bedbîn, yên bê bingehên zanistî û akademîk, çareser nabin. Belê, çaredîtin û çareser kirina van pîrsan, wilo jî pîrsa zimanekî" yekgirtû" di prosesa lêkolînên zanistî re, di gêra nerîn û guftûgoyên rêzdarî re û di riya konferans û kongireyan re têne bidestxistin. **Kovarên Kurdî : Aso ; Deng ; Gelawêj ; Hevînd ; Jîn; Newroz ; Perwan ; Pirs ; Roj ; Vîn û Ziman**